

ARMANC
Xwedî: Yekîtiya
Karkeren
Demokraten
Kurdistanê
★
Ji mehê carekê
dertê
Hejmar : 70
Adar 1987
Buha: 10 Skr.
2.5 DM

Armanc

SERXWEBUN • DEMOKRASI • SOSYALIZM

Adress : Nordenflychtvägen 20, 112 51, Stockholm, Tel: 08 - 52 87 56 □ Adresa têkili û naman : P.O. BOX 240 12, 750 24 Uppsala / SWEDEN □ Postgiro : 50 37 99 - 9 □ ISSN 0348-7388

ARMANC
Issue by
The Demokratic
Union of
Kurdish Workers
★
Monthly Kurdish
Magazine
Nr : 70
March 1987
Price: 10 SK.
2.5 DM

hovitiya diktatoriya faşist a Tirk

30 balafiran bombe barandin ser gundê Kurdan

□ Di erdê re jî sewqiyatek mezin çû ber bi Kurdistana Iraqê de. Hekarî di bin postalan de diperçiqe.



Roja 4'ê adara 1987'a seat di 8'ê sîbê de 30 balafirên ser ên Tirk, êrîsek hov û har birin ser gundê Kurdistan Iraqê yên herêma rizgarkirî.

Balafirên ordiya xwînxar a Tirk, ji balafirgehîn leşkerî yên Meletî Diyarbekirê rabûn û her yekê bi du êrîsan bombebarandin. Li ser hev di 60 êrîşen bombebaranî de 9 malbendê (cîwarê) Kurdê gundî yên bê gûneh hatin bombekirin.

Bi vîêrîşê re, di erdê re jî ordiya Tirk sewqiyatek mezin rîkiriye ser hudûdê Kurdistan Iraqê di vê sewqiyatê de, tirenbelêna naqliyatê yên leşkerî têrî nakin, fermandarêne diktatoriya faşist ên Diyarbekir, dest danîna ser otobus û kamyonê sivîl û esker û ci-

bîrxane bi wan jî têni kışandin.

Der û dora Hekariyê ji ali Merdin, Sêrt û Wanê ve bi temamî hatiye girtin, cûndin û hatin qedexe bûne, xetê telefonê hatin birin û qontrol hemû ketiye bindestê ordiya dagirker. Operasyonê dijwar li herêmê têni çekirin. Herêma Sêrt, Hekari û hin ji Merdin û Wanê, bi gund û bajarê xwe ve ketine bin postal û singu yên ordiya Tirk.

Ordiya Tirk vê êrîşê, bi izn û alîkariya rejimê Seddam û diktatoriya faşist a Tirk sala 1983 ya di nav xwe de peymanek imze kiribûn ku wê her dewletek karibe di nav hidûdê yê din de êrîşê bibe ser tevgera rizgarixwaziya Kurd. Di vê êrîşê de, balafirên

Tirk, 25 km. ketin nav hidûdê Kurdistan Iraqê. Li gor nûçeyen gihaştî, di erdê re jî leşker 7 km. ketiye nav erdê Kurdistan Iraqê.

Roja 22'yê Sibata 1987'a li gundê Hekariyê; Taşdelen 14 kes hatibûn kuştin ku 9'ê wan pîrek û zarok bûn. Hukumeta Tirk beyankir ku vê kuştina han ji bal Apocian ve hatiye kirin. Li gor hukumetê, yên êrîş biribûn ser gund kincen leşkerê Tirk li xwe kiribûn. Bi vê büyerê re, diktatoriya Tirk, idia kir ku kesen êrîşê gund kirine, derbasî Kurdistan Iraqê bûne. Û ev kes ji bal hêzên pêşmergên Kurdistan Iraqê bûne. Ü ev kes ji bo İzzet Oğuz Kandemir, Hüseyin Urum, Mehmet Şahin, Dûmahîk r. 7'an



Do terqa Fila (Ermeniyan) bû,îro dor hat ser Kurda Ferman li Kurda rabû

• Fermana sirgûna miletê Kurd ji Dersimê destpê dike, lê wê 9 milyon û nîv Kurd têkevin ber qanûna sirgûne.

Diktatoriya faşist a Tirk, planê sirgûn kirina 9 milyon û nîv Kurd temamkir, niha dest bi bicîanîna planê bûye. Hukumeta faşist, bi mahna çandina dara û avakirina daristanan dixwazê gûndiyê Dersimê, Erzincanê, Qersê, Agırıyê, Wanê û Hekariyê, hin gundê çiya yên Diyarbekir û Elezîzê rake sirgûnî Anadolu roava nav Tirk bike.

Sirgûn ji Dersimê destpê dike. Hazîriya sirgûna Kurda, li Dersimê temam bû yê û ilamî 233 gundê vî bajarı bûye ku wê jî gundê xwe bênen rakirin li der û dora bajarê Tirk ên wek Mîrsin, Antalya, Mûxla û İzmîrê bêni bicîkirin. Ji gundiyan van gundan re hat gotin ku heta 10'ê Si-Dûmahîk r. 7

Dawa PPKK'ê ya Anqerê: 9 Kesan 112 sal û nîv ceza xwarin

Mehkema Anqerê, di dawa PPKK (Partiya Pêşeng a Karkerî Kurdistan)'ê de, ku havîna 1984'a destpêkiribû bîryar da. Ji bo 7 kesan 13 sal û 4 meh, ji bo kesekî 14 sal û 8 meh û ji bo yekî jî 4 sal ceza hat birîn.

Mehkema dawa PPKK'ê ya Anqerê, ku ev du sal û nîv in dom dike, roja 17'ê meha Sibatê biryara xwe da; cezayê zindanî li 9 kesan birî. Li gor di biryaren mehkemê de têni xuyakirin sedemê cezagirtina van kesan ew e, ku di Partiya Pêşeng a Karkerî Kurdistan de cih girtine, bi riyan bêqanûnî, nehêni û çekdarî xwestine hin erdê bin hukmê dewleta Tirk veqefînin û Kurdistan serbixwe avabikin.

Li gor biryara hakimên leşkerî, ji bo İzzet Oğuz Kandemir, Hüseyin Urum, Mehmet Şahin, Dûmahîk r. 7'an



Mustafa Mencutek 14 sal û 8 meh ceza xwar. Foto: Armanc


Ekrem Karahan, Osman Tokgöz, Cumali Gökçalp û Ubeydullah Kaplan cezayê 13 sal û 4 meh hefsa giran hat birîn. Pişî hefsê 4 sal û 5 meh û 10 roj wê li bajarê xwe di bin çavdêrî û kontrolê de bimînîn û heta heta wê nikaribin di karûbarêne dewletê de bixebeitin. Ji bo Mustefa Mencutek jî cezayê 14 sal û 8 meh hefsa giran, 4 sal û 10 meh û 20 roj mayina di bin çavdêriyê de hat birîn. Ew jî wê nikaribe heta heta di karê dewletê de cih bigre.

Ji Mehmet Şerif Müstak re jî 4 sal hefsa giran, salek û 4 meh li Silopiye mayina di bin çavdêriyê de hat birîn. Ew jî, pişî cezayê xwe wê heta 4 salan nikaribe di karê dewletê de cih bigre.

Ceylanpinar :

Cûnta Faşist Ednan Tuysuz kuşt

- Leşkeren cûntayê dixwazin xwîna Ednan jî winda bikin.
- Malbata Ednan dike nake, nikare meytê xwe bigre.



Ednan Tuysuz. Foto: Armanc

NEWROZA WE PİROZ BE!



Kurdistana Iraqê Di navbera hêzên welatparêz de hevkariyênuh

Di 8'ê meha Sibatê de (8.2.87) di navbera Yekîti Niştimanî Kurdistan (YNK) û Partî Demokratî Gelî Kurdistan (PDGK) de peymanek hevkariyê hat imzekirin. Û ev hevkariyê hat imzekirin, ji ali her du hêzan ve bi hewkarî resmî ket jiyanê jî.

Li gor belavoka eşkerekirina vê hevkariyê û informasyonê ku me bi dest xist, di civînê de bi giranî li ser gel-sên (problemê) girîng yên Kurdistanê, Iraqê û herêmê hat sekinandin. Û li ser van

nuxtên jêrîn her du hêzan protoqolek imze kirin.

Wê her du hêz jî xebata siyasi, leşkerî û propagandayê bi hev re bimeşîn û li gel viya jî PDGK wê bikaribe xebata xwe ya siyasi di mintiqân YNK de bide domandin. Wê xebatên çekdarî bi koordîna her du hêzan bê idarekirin. Nuxtak din jî, wê ji bo avakirina cephak Kurdistanê, ku karibe ji gelê Kurd re pêşengiyê bike xebat bête kirin. Û pişî avakirina vê cephak Kur-Dûmahîk r. 7'an

Mehabad :

□ Yekemîn Kongra Kultur û
Edeba Kurdî civiya...

Di 18'ê meha sibatê de hêzên leşkerî li gundekî Ceylanpinar girtin ser mala Ednan Tuysuz, pîreka Ednan, Suphan Tuysuz hedîse wisa tîne zimên:

'Peyê min cûbû Swîregê ser deyndarekî xwe. Wê rojê cendîrma hat li Ednan pîrî. Çaxa Ednan hat min jê re go cendîrma li te pîrsîne. Çû teslim bû. Di dû re hin cendîrma hatin ez û zarokên min jî birin gerekolê. Min xistin odak û di odak din de jî li peyê min dixistin, işkence pê dikirin. Paşê min serbest berdan. Roja din jî min re gotin kû Ednan di nav erdê mayinkirî de hatiye kuştin. Le qereqolê pişî işkencê mîrîve kû bi alîkariya çend leşkeran here daşîrê (tuvalerî) ez nizanim çawa dikan'

8 ADARÊ Û VATINIYÊN JINÊN KURD

SABÎHA

Jinê Kurd, ên li hundir welet, isal jî 8'ê Adarê roja jinan a navnetewî bi awakî cemawerî li Kurdistanê pîroz bikin. Jinê derveyî welat bi awakî xemgîn, ji welatê xwe yê şîrîn dûr 8'ê Adarê pîroz kirin. Di her warî de an jî di her qada xebatê de, hewcedariya tevgera hêzên Kurd ên demokratik û cemawerî, û yên siyasi bi piştgirtiya navnetewî heye. Ji bo tevgera demokratik a jinê Kurd jî bi tevgera jinan a navnetewî re hevkâkirin piştgirî nişandan gelek girîng e. Ji bo vê, divê naverok û girîngbûna 8'ê Adarê, Roja jinan a Navnetewî, bi awakî zanistî bi jinê Kurdistanê bête famkirin. Ji xwe, dewletê dagirker, ji piştgirtiya navnetewî ya bi gelê Kurd re pîroz dîtîrsin. Sebeba ji ber pîrozkirina 8 Adarê, di sala 1979'an de, cezakirina 6 jinê Kurd ên endamên DDKAD'ê (Komela Jinan a demokratîn şoreşer) bi 48 salan jî ev bû.

BI KURTAYÎ DÎROKA 8'Ê ADARÊ Û TEVGERA JINAN A NAVNETEWÎ

Di 8'ê Adar'a sala 1857'an de, ango 130 sal berê, jinê Amerika Yekbûyi li bajare Newyorkê, ji bo ku rewse karê xwe baştîr bikin li dij karbidestan tevgerêk pêk anîn. Hukûmetê bi polis û leşkerêne xwe hêrişike hov bir ser ve tevgerê. Jinê kû besdari vê tevgerê bû bûn hatin gulebarankirin. Ji wan hinek hatin kuştin, hinek hatin zîndankirin û çend pêşengên wan jî hatin dardekirin. Piştî van salan, tevgera jinan bi daxwazên hîn pêşverû roj bi roj

frehtir bû. Li dij vê barbarîya dewleta Amerika Yekbûyi, di warê navnetewî de, ji çar alîyên dinê dengê jinan ê protestoy bilind bû. Ev bûyera di warê navnetewî de sebeba bingehavetina piştgiriya tevgera jinan a demokratik. Piştî van salan tevgera jinan bi daxwazên hîn pêşdetir roj bi roj fireh bû.

77 sal berê di sala 1910'an de, jinê cihanê di pêşengîya jinê sosyalist de, li paytexta Danîmarka yê li Kopenhagê kongrek pêk anîn. Di vê kongra han de, ji serekên bijartê, yên proletarya Almanyayê Clara Zetkin pêşniyâr kir, kû 8'ê Adarê bibe roja jinan a navnetewî. Ev pêşniyara di kongrê de bi dilgesî hate qebûlkirine. Ev bîryar de demek kurt de li gelek welatan jî hate qebûlkirin.

Belê, ji sala 1910'an û bi vir de, 8'ê Adarê wek roja jinan a navnetewî tê pîrozkirin. Di 8'ê Adarê de jinê li çar alîyê cihanê babet babet civînan, meşan mitîngan pêk tînin. Di van karan de li ser pîrsen jinan û girîngbûna piştgirtiya navnetewî radwestin. Di van salan dawîyê de, tevgera jinan a demokratik a navnetewî rûmèteke mezin dide tevgera asîtiyê. Ji bo vê, di civînen 8'ê Adarê de, aşti wek temaya heri girîng cîhe xwe digrê.

Wek têne zanîn, faşizm neyare gelan, ê yekemîn e. Tevgera jinan a navnetewî ev rastîya baş dizani bû. Ji bo vê yekê, piştî sala 1930'yî hêzên jinan safen xwe qewitir kirin.

Di sala 1943'an de, li dijî faşizm û li dijî herba cihanê kongra jinan li Parisê civîya. Ji bo berxwedana jinê cihanê li dijî faşizmê, ev kongra

han bûn bingeha programa Federasyona Jinan a Navnetewî. Piştî vê buyerê, di l'ê Çileya Pêşin a sala 1945'an de Federasyona Jinan a Navnetewî ava bû.

Îro, ji 117 welatan 135 organizasyon Jinan endamên Federasyona Jinan a Demokratik a Navnetewî (FJDN) ne. Ji bili vê federasyonê çend federasyon û yekîtyen jinan en navnetewî yên din jî hene. Wek, ji bo Azadî û Aşitye Yekîtya Jinan a Navnetewî, Organîzasyona Jinan a Pan-Afrîka, Konseye Jinan a Navnetewî, Cemîyeta Xiristîyan a Jinê Ciwan ên Cihanê. Übi navê aşîtyê jî, li Swêd, Danîmarka, Norveç, Holanda, Fransa, Almanya û çend welatîn din çend organizasyon jinan hatine damezrandin.

DDKAD Û 8'Ê ADARÊ

Jinê Kurdan 4 Kurdistana

NAMEN GİHAŞTİ

Ji Hamburgê du name ji M. Ali; Ji Suryê H. Holt; Ji Fransayê Amed; Ji Västeras (Swed) F. Ceweri; Ji Stockholmê M. Xarpet; Ji Almanyayê Zinar Necat; Ji Londra-yê Kurdistan İşçi Derneği; Ji Cizîrê C. Rojen; Ji Holanda-yê Bextiyar Shomayî; Ji Erzurumê Sernas Färqîn; Ji Damîmargê Z. Seyda; Ji Troisdorfê (Almanya) Şerwan.

Xelk 24 Seeatan Hereşiyê li gundê xwe dike.

Dewleta Sûriyê, di serê meha Sibatê de, bala gundiyan ser hidûdê Tirkîye (Kurdistanâ Tirkîye) kësa, ku heresiye li gundê xwe bikin û ji bo êrîşek muhîtemel a Tirkan hişyar bin.

Piştî vê agadariyê bi çend rojan (7.2.1987) du eskeren Tirk hatin gundê Deravê Ke-

bû platformek girîng. Kongra Yekîtya Jinê Fransiz a kû di sala 1945'an de ci-viya, daxwaza kombûna kongreka jinan a navnetewî kir. Ji xwe li çar alîyê cihanê jinê sosyalist ji bo amadeke kongreke wiha xebat dikirin. Li ser pêşniyara kongra Yekîtya Jinê Fransiz, di 26'ê çiriyâ paşin sala 1945'an de kongra jinan a navnetewî li Parisê civîya. Di vê kongrê de, ji 40 welatan 850 jin besdar bûn. Biryarê vê kongra

Tirkîye cara yekem di 10'ê Adar'a sala 1979'an de, li Diyarbekirê bi awakî cemawerî di bin pêşengîya DDKAD'ê (Komela Jinê Demokratîn Şoreşer) 8'ê Adarê pîroz kirin. Berî vê pîrozkirina cemawerî jî, jinê demokratîn şoreşer bi babet babet xebat 8'ê Adarê pîroz kirin. Lî pîrozkirina herî mezîn a sala 1979'a bû. Di vê pîrozkirin de, bi sedan jinê Kurd bi hevre şârîn jinan ên netewî û navnetewî avetin.

Bi munasebeta vê pîrozkirinê,

latê me naqete. Lî rastîyek heye, û ew jî ev e, kû rewşa jinê Kurd di nav gelê Kurd de rewşa herî xirab e. Jinê Kurd him di bin zordarîyen mêtîngîhî û him jî, ji ber têkiliyê civakî, yên paşverû di bin zilm û tadeyîya meran de ne. Ji % 99'ê jinê Kurd bi

faşist de qat qat zêdetir bû. Bi hezaran jin bê mîr, bê law an jî bê qîz man. Jinê girtî barbarîyê nedîti di girtîgehan de dîtin. Leşkeren faşist di girtîgehan de jin tazî kirin û dupiş û mar berdan canê wan.

Rewşa jinê gundê Kurdistanê, di her warî de ji cehnîmê xirabtir e. Li çar alîyên Kurdistanê, nemaze li gundê nêzîka hudûd zilma leşkeren dewleten dagirker bûye perçek ji jiyana jin û zarokê Kurdistanê.

Wek me li jor jî got, bi bin gehî bişaftina gelşen jinê kurdan girdayî serxwebûn û azadbûna Kurdistanê ye. Belê, hinek pîrsen jinan, ên taybeti jî hene lê bi tevayî pîrsen mîr jin û zarokê Kurdan in û dîjîminê wan ê yekemîn jî dewleten koloniyeşîf in. Wek kû carnan di tevgera jinê welatîn kapitalist de tê xuyakirin, di tevgera jinê Kurd de jî bes dijatîya mîran kirin, û dîjîminiye mîran wek merceki bingehî ji bo hebûna xwe qebulkirin, bi tenê feydî diqîhîne dijiminê koloniyeşîlist. Em jinê Kurdan di her warî de, di warê ekonomîk, siyasi û civakî de wekhevî dixwazin lê di warê ehlaqî hinek mîran, ê nebaş de wek femîstan em wekhevîyên naxwazin. Wek tê ye zanîn tevgera femînîstiyê tevgerere burjuwayî ye û di welatîn paşdehişti de zû bi zû nikare bicîbîbî, lê dîsa jî divê tevgera jinê Kurd jî van dîtinê çewt bête parastin.

EM JINÊ KURDAN DIVÊ JI BO VAN DAXWAZA TEVGERA WÊ XURTIR BIKIN.

a) Di her warî de wekhevî (siyasi, ekonomîk, civakî).

b) Bi zarokê xwe hînkirina zimanê Kurdi.

Dûmahîk r. 7'an

Stiriyen me

Bavê Nazê

• AGAHDARI •

□ Xwendevanê hêja, wê ji iro û pê ve Bavê Nazê di vî quncikê de nenivîsine.

Ji bo alîkariya ku heta iro Bavê Nazê bi me re kir, em geleki spas dikan.



xwendin û nivisandina Kurdi nizanîn. Ji % 80 zêdetir, xwendin û nivisandinê bi zimanîn dewleten dagirker jî nizanîn li gor qanûnê dewleten dagirker, bi taybeti jî li gor qanûnê dewleta Tirkîye, kû, merovek dibistana deshpêk temam neke, nikare di dezgehekê de karekî fermî bikê. Ji bo vê, bêkarî ango xelay kar, di nav jinê Kurd de pîrtir e. Politika koloniyeşîlist bûye sedemta kirîza aborî, û civakî. Rewşe weha, nexweşîya xwefirotinê di nav jinê de zedetir kirîye. Qelen hîn wek edeteke kevneperest li Kurdistanê hebûna xwe dîparêze. Ji bo bê şexsiyekirina jinê me, radyo, TV, rojname û dibistanen koloniyeşîlist propagandakî nedîti dikan. Di bin tesîra van propagandan de neman û gêjnebûn bi rastî jî nemumkun e.

Zordariya li ser jinê Kurdistana Tirkîye, di van 6 salen di bin hukma Dîktatoriya

Rewşa jinê Kurd, ji rewşa we-

• NAMEYÊN XWENDEVANAN •

ran. Ev gundê han di navbera Qamişlo û Dêrika Cizire de ye.

Qereqola Sûriyê agadariya dewleta xwe bi bîranî, van her du eskeren girtin. Piştî seetek du seetan eskeren Tirk ên ser hudûd dîtin ku hevalen van venegeriyan, qerargeha xwe ya Cizîrê agadar kirin, ji Cizîrê nêzîkî 300 eskeren Tirk hatin dor li gundê Deravê Keran, eskeren Tirk lê nêrîn ku ev parî ne yê daqurtandinê ye, paş de vegereyan. Pişt re her du eskeren Tirk li Qamişloye teslimî Tirkîye kirin.

Niha timamê gundiyan Kurd ên ser hidûd, bi şevê hefta sibê çekê wan di destê wan de notirvaniya gund û can û mal û namûsa xwe dikin. Ü vê yekâ han jî dibêjîn: "Tirkên xwînwar, hov û faşist ji xwe yê anîne serê me bes e. Li wî alî hidûd 50 mitro nêzî me mam, xal, pismam û dos-tîn me rûdinê, em wanji dûr vê dibînîn, lê nikarin bang li wan bikin. Cezayê gazî kirinê guleyê cendirmê wan e. Me ji hev perçê kirine, zilm û zordestiyê li ser birayen me

dimeşînîn, hîn dilê wan rehet na-be, dixwazin niha me jî ji ser cî û warên me bi dûr xin. Lî bira vê yekâ han baş zanibin ku, hingî dilopek xwin di damarêne me de bigere em serî li ber gef û erîşen Tirkan danaynin. Bira kerem kin bê, wê çaxê wê bibînîn erîş û gef ci ne".

Gundiyan Kurd ên gundê ser sinor, her çiqas di nava qeleqetekê û nerchetye de ne jî, baweri-ye wan a gelek xurt û ezmek wan a pirr bilind ji bo serkeftina wan a rojêne pêshye. Ev bîr û baweri-dikare re li ber erîşek wiha bigere.

Silavên germ ji rojnama Armanc re a ku em tinûyê xwendîna wê ne.

Xwendevanê Armancê Qamişlo-Dêrik

ABONE BE



ABONE BIBÎNE



OLOF PALME : Dostê gelê bindest

H. MIZGÎN

Salek berê 28'ê Sibata 1986 an gelek miletên dinê ala xwe daxistin nîvî. Kuba, Nikaragua, Tanzanya û Hîndistanê rojek an jî du roja -li Nikaraguayê sê roj-şin ilan kirin. Di kongra 27 an a PKYS de hemû nûner û mîvanan ji bo hurmet û bîrâfna Olof Palme deqîqekê li piya rawestiyen.

Belê di 28'ê Sibata 1986 an de me dosteke xwe wenda kir. Ev dost bi rastî jî dostê me Kurda bû. Wî ji bo me Kurda doza azadiyê dikir. Wî dixwest pîrsa me Kurda bibe Netewê Yekbûyi, ku li wê derê li ser Kurdistanê bête munasefe kirin.

"Kevoka Aşityî" dostê mîleten bindest OLOF PALME di orta cadê de ji alî dijminen aşityî, bi desten xwînrej hate kuştin. Di ser re salek derbas bû, lê belê pir mixabin qatil hêjî serbest digere. Di salekê de ji bo girtina qatîl 30 mîlyon kronê Swêdî hat xerc kirin. Lê çi feyde, tu tişt nehat bi dest xistin.

Hans Holmér (serekê grûba légerina qatîlê Palme) piştî kuştina Palme bi du mehan ji bo masmedya şopa xwe ya bingehîn ekere kir. Li gor vê şopa bingehîn, kurd wek qatil dihatin nîşandan. Herçiqas ên ku şik jê dihatin kirin bi qasî hejmarên tiliyê destâ bûn jî, lê dîsa hemû Kurd wek qatilan hatin nasandin. Li ser Kurda spekulasyonê nedîti hatin kirin. Kurdêni li Swêdê di bin îthamek giran de man. Zarokên Kurda li dibistanan, karkerên Kurda li kargehan, xwendekarê Kurda li unîversitan ketin nav rewsek dijwar. Kar û xebatê salan ku



dilhêzî û pişgîriyek di nav gelê Swêdî de asfirandibû, di demek pir kurt de ji holê rabû. Li vir divê em qebûl bikin ku ji do bêtir û tekûztir xebat divê ku em bikaribin birînên spekulasyonan derman bikin. Di vî warî de barekî giran dikeve ser milê her Kurde welparêz.

Baş e, ma gelo di van bûyeran de qet rola Kurda tuneye? Helbet... Kuştina Enver Ata li Uppsalayê, kuştina Çetin Gungor li Stockholmê, kuştina Mustafa Tangüner li Danî-

marqayê û kuştina hin kesen din li hin welatên Ewrupa û ji aliye din bi belavokan tehdîtkirina hin kes û dewletên Ewrupa di bûyerên bûyî de rolek mezin leyîstin. Ev bûyer di dema wilô de ku li ser mesela Kurdan dihat peyvandin çêbûn.

Parlementerên Swêdî ji hukumata Swêdê daxwaz dikirin ku pirsa Kurda bibe Netewê Yekbûyi?

Belê Olof Palme hat kuştin. Wek me li jor jî got; mîleten bindest dosteke xwe wenda

kir. Lî belê dijminen aşityî bi ya xwe kirin. Wisa kirin ku şopa qatîlê Olof Palme wenda bibe. Ji bo em bikaribin ji vê rewşê baştar fahm bikin, min divê hinekî gala Hans Holmér bikim.

Hans Holmér berî ku bibe şefê ewlekarî, şefê Säpo (İstihbarata Swêdê) yê bû. Di wê demê de li dij hêz û kesen cep tehfîqat ve kiriye, telefonen wan bi dizî daye guhdarî kirin. Danûstandina Säpo'ye bi CIA re xurt kiriye. Ew kesen ku nuha notirvaniya wî dikin kesen profesyonel in û li Îsrail û Dewletên Amerika Yekbûyi talîm dîtine. Hans Holmér bi xwe mirovên xwe helbijartîye. Xuya ye ku Hans Holmer ji alî otorîte û qewetbûn ve ciyê xwe girtiye. Hukumeta Swêdê vê dawiyê mecbûr ma û mudaxalê kir û di şopajotina qatîlê Palme de hin guherandin pêk anî. Lî belê pir mixabin hukumetê di warê bi xistina Hans Holmér de gavek paşde avêt. Hans Holmér cardin bi selahiyet û merivên xwe di guruba şopajotina qatîlê Olof Palme de ma.

Hans Holmér tim û tim bala gelê Swêdê kişand ser şopa xwe ya ku jê %95 bawer e. Bi vî awayî şopê din ji holê rabûn an jî hatin ji bîr kirin. Ma ne ji xwe niyet jî ev bû.

Televîzyona Yekîtiya Sovyet li ser kuştina Olof Palme filmek çêkir. Televîzyona Swêdê biryar da ku vî filmî di roja 27.02.1987'an de şanî xelkê bide. Li ser vê yekê du karbdesten Konsolosxana DAY çûn Televîzyona Swêdê "ziyaret" kirin. Daxwaza

wan ew bû ku filmê kuştina Olof Palme neyê weşandin.

Li gor wan, film bi xwe propaganda dijî DAY dike. Pêşî şefê Televîzyona yê Kanal-1 rexne anî ser karbdesten Konsolosxana DAY lê dema kevneperesten Swêdê wek Partiya Moderat (Konservatif) û hêzên din jî rexne anîn û daxwaz dikin ku weşandina filmê li ser kuştina Palme paşde bixin, daxwaz hate qebûl kirin. Ji vê kirinê jî xuya bû ku kevneperesten Swêdê, hêzên dijî aşityî naxwazin li ser hin rastiya û hin hêzan bê axaftin. Ew dixwazin şop wenda bibe û qetil nayê ditin.

Olof Palme di pirsa Aşityê û çekdaxistinê de xebatê dûr û dirêj kiribû. Bi saya van xebatê pirr bi nav û deng û xwedî otorîte bû. Bi taybetî di pirsa Amerika Latînî de bûbû gulek sor ji bo gelê Amerika Latînî. Lî belê ji bo DAY û kevneperest û faşîstên Amerika Latînî ew yek striyekî bû.

Olof Palme bi rexne û érisen xwe, bi parastina aştya dinê û têkoşîna xwe ya ji bo çekdaxistinê derbek mezin li DAY û welatên wek Şîli dida.

Olof Palme di siyeseta derive de danûstandina Swêdê û Yekîtiya Sovyetê dixwest pêşde bibe. Hîmê vê siyasetê ji avêt. Navbera Swêdê û Yekîtiya Sovyet roj bi roj baştar bû, sarbûn ji holê rabû, propagandeyen li dij Sovyetê hînek be jî kêm bûn. Ev rewş bi kevneperesten Swêdî xweş nedîhat.

Bofors fabrikayek Swêdê ya naskiriye. Çekên pirr xurt çêdike û di bazara çekan de ciyek girîng digre. Ev fabrikê li

dij qanûnen Swêdê çeka difroşen hin welaten. Olof Palme li dij kar û barê Bofors derket û rexnekî giran lê girt, komîsyonek tayîn kir ku kar û barê Boforsê kontrol bike û raporekê amade bike. Lî belê hin kesen ku kevneperesten en ku li Wezereta Derve ya Swêdê kar dikin, xeber gîhandin Boforsê. Bofors hemû dokûmanen xwe ji holê rakirin. Komîsyonê karê xwe domand. Lî belê yek ji vê komisyonê -xwedî rolek gi-ring bû-hate kuştin.

Olof Palme di pirsa Aşityê û çekdaxistinê de xebatê dûr û dirêj kiribû. Bi saya van xebatê pirr bi nav û deng û xwedî otorîte bû. Bi taybetî di pirsa Amerika Latînî de bûbû gulek sor ji bo gelê Amerika Latînî. Lî belê ji bo DAY û kevneperest û faşîstên Amerika Latînî ew yek striyekî bû.

Olof Palme di pirsa Aşityê û çekdaxistinê de xebatê dûr û dirêj kiribû. Bi saya van xebatê pirr bi nav û deng û xwedî otorîte bû. Bi taybetî di pirsa Amerika Latînî de bûbû gulek sor ji bo gelê Amerika Latînî. Lî belê ji bo DAY û kevneperest û faşîstên Amerika Latînî ew yek striyekî bû.

Olof Palme di pirsa Aşityê û çekdaxistinê de xebatê dûr û dirêj kiribû. Bi saya van xebatê pirr bi nav û deng û xwedî otorîte bû. Bi taybetî Hans Holmér bala xwe bidin vî alî. Bila şop qatîlê Olof Palme li DAY, li Tirkîye, li Îsrail, li Şîli û li Afrika Başûr bîgerin.

Belê divê polîse Swêdê giraniyan xebata xwe bide ser van dewletên terorist. Dema mirov tespîta jorîn kir, pirsa "ma gelo SAPO diwîre karekî wiha bike?" tê aqîlê mirov. Ma qey ne wisa ye?

Reagan:
Ji Ehmaq û bêaqila yek e'



KONTRA TÎCARETA NARKOTIKÊ DIKIN

Li gor rojnama Newsweek, Kontra bi narkotikê ve mijul dibe. Kontra, li welatên ku mequerên xwe daniye xeşîşî dişine, jê eroîn çêdike û difroşen. Di vî karî de Kontra alikarî ji CIA distîne.

Kontra ne tenê li dij hukumeta pêşveru şer dike, her weha kaçuxiya eroînê ji dike.

DAY bi riyek ferî (resmi) beyan kiribû ku wê li dijî narkotikê têkoşînê bide. Lî belê vaye CIA bi xwe alîkariya Kontra dike û ji wan re bazarê peyda dike. Helbet bazar ne tenê DAY bi xwe ye, welatên Latîn Amerîki wek Costa Rîka, El Salvador, Guatema û h.w.d ji bazarên Kontra ne.

Piraniya perê ku ji firotina eroînê tê bi dest xistin dikeve berîkên serekên Kontrayê. Ji van pîran ji sê paran parek diçe stendina çekan.

Rojnama Newsweek bi pilot Cary Betzner hevpeyvînek kiriye. Cary Betzner bi salan ii Kontravê re nîlofi kirive û

di trafika narkotikîye de rolekî gi-ring listiye. Cary Betzner di hevpeyvîne de eskere dike ku serekên Kontrayê ji vê ticaretî bî mîlyonan kar dikin û van peran dixin kîsîn xwe û di vê ticaretê de Kontra ji CIA alîkariye distîne.

Newsweek dinivise ku CIA di vî karê ha de şirketa xwe ya teyarê, Southern Air Transport bi kar anîye. Kesen ku di çandina xeşîş de kar kîrîne qîrûsek ji nestendine. Yek ji serekên karê narkotikîye George Morales dibêje; kesen ku di çandina û çêkirina eroînê de kar kîrîne hatin xandinê.

Balafirxana Bêrûdê ji bo trafika navnetewî hat vekirin û kete bin kontrola Suriyê. Leskerên Suriyê rojhîlatê Bêrûdê xistin bi kontrola xwe.

LEŞKERÊN SÛRIYE KETIN LUBNANÊ



Li ser daxwaza hin serokên Lubnanî, wek Welid Canbolad û Reşîd Keramî, leşkerên Sûriyê ketin Lubnanê. Berê jî nêzî 400 leşkerên Sûriyê li Bêrûdê bi cî bûbûn.


Serekkomarê Lubnanê Emîn Cemayel li dij tevgera leşkerî ya Sûriyê derket, lê belê heyâ nuha tu liberxwe-danek leşkerî nekirin. Bi tevgera leşkerî ya Sûriyê şerî de navbera Emel û PSP (Partiya Pêşverû ya Sosyalist) PKI (Partiya Komunist a Lubnanî) rawestiya.

Pêşniyara AŞTİ LI ROJHILATA NAVİN Civaka Aborî ya Ewrûpa di civîna xwe ya roja 24.2.1987'a de biryara pêşniyara civînek aştîji bo Rojhîlata Navîn stend. Li gor vê pêşniyare divê civînek navnete-

PSP û PKL jî hêzên xwe ji kolanen Bêrûdê kişandin. PSP û PKL bi hev ra li dij milîşen Emel nêzî şes roja şer kirin û di vî şerî de nezî 200 kesen si-vîl hatin kuştin.

Îro li Lubnanê nêzî 7000 leşkerên Sûriyê hene. Sûriyê roj bi roj wê kontrola xwe li ser Bêrûdê bi hêzîr bike. Ji nuha ve dest pê kiriye çekan kom dike. Kesen ku çekê xwe teslim nakin, tê girtin.

PÊŞNIYARA AŞTİ LI ROJHILATA NAVİN Civaka Aborî ya Ewrûpa di civîna xwe ya roja 24.2.1987'a de biryara pêşniyara civînek aştîji bo Rojhîlata Navîn stend. Li gor vê pêşniyare divê civînek navnete-



NETEWEWERWER Ú XEBATKARÊ KURD FEHMÎYÊ LİCÎ

Ji Armancê ra pir sipas dikim, ku pirsa Fehmîyê Licî ji min dike û dixwaze ez di derheqê jiyan, xebat û nivîsinê wî da haydariyên xwe bînîsim.

Bi rastî ez ve pêşniyaza Armancê şayanê sipasê dibinim. Lewra mebest ji pêşniyazê ev e: Armanc dixwaze ku neteweperwer û xebatkarê Kurd ên kevin, ên ku hatine ji bîr kirin yan jî hêdi-hêdi jibîr ve dibin- bi xwendevanê xwe bide nasîn, wan bibîr û ji bo xebata iro û dahatû bîke mînak. Belê neteweperwer û xebatkarê kevin, ên ku hêja ne bibin mînak heta bibin aydek, bê guman yek ji ji wan Fehmîyê Licî ye.

Her çiqas Fehmîyê Licî di dema xwe da li hemû perçeyen Kurdistanê, li ba hemû welitevîn û entelektuelen Kurd mirovekî naskirî bû û bi xebatên xwe yên mefadar li ba her kesî dihat teqdîr kirin, xasma bi wêrîn jêhatîbûn û jîriya xwe bi nav û deng bû. Lî sed mixabin iro Fehmîyê Licî ji wêk gelek xebatkarê kevin ên din, ji aliye gelek kesan ve nayê naskirin. Ü çend kesen ku wî nas dîkin jî haydariya wan di derheqê wî da gelek kêm e.

Hem ji bo vê yekê, hem ji ji bo kesê ku bixwaze li ser jiyan û xebata xebatkarê kevin lêkolîn bike, ezê hin haydariyên xwe yên di derheqê Fehmîyê Licî da bi kurtî bînîsim.

Fehmîyê Licî ji navçeya Lice-Taxa Qeya, kurê Bîlal Efendî yê. Lî sed heyf tarixa ji dayikbûna wî nuha nayê bîra min. Di sala 1967 an da li Diyarbekirê çû heqiyê û li Lîcê hat binax kirin.

Fehmîyê Licî wek hevriyê xwe Bavê Tûjo (Dawawekîli Mehemed Efendî) bi dawa-wekiliyê mijûl dibû. Jê ra Fehmîyê Licî, Fehmîyê Bîlal yan jî Fehmî Efendî dihat gotin. Di xebatên siyâsi da navê wî Eli Efendiyê Licî (Lîcîeli Eli Efendî) bû û di çîrokên xwe da jî navê Mamostâ bikar dianî.

Jiyana wî, tîstênu ku hatine serê wî rengareng û gelek dilêş in. Ji ber vê yekê û ji ber ku tenduristiya min ne li cî ye û dilê min jî gelek zîz bûye ez nuha wan li cîye wan ji rojêna dahatû ra dihêlim.

Fehmîyê Licî di zarokiya xwe da bîrûbaweriya neteweperwerî û welitevînyê ji bavê xwe Bîlal Efendî hilgirtibû. Ji ber vê yekê dilê wî tim bi evîna welat dikiliya, wî tu

sîper nas nedikir, bi wêrînek mezin û bi serbilindî ji bo doza serxwebûna neteweyî xebatên hêja û kérhafî dikir û heta cû heqîya Xwedê ji dilê wî bi evîna welat dikiliya. Ji ber vê yekê jê ra "Fenafîl Kurd" dihat gotin. Yanî ê ku di Kurdîtiyê da noq bûye, xwe ji Kurdîtiyê ra kiriye gorî Kurdîti bûye perestgaha wî.

XEBATÊN FEHMÎYÊ LİCÎ
Hin ji xebatên wî yên ku min ji devê kesen hemdemê wî bi-hîstibûn û min ji wî jî pîrsibûn, bi tevî hin hevpeyvînên ku min pê ra kirkibûn bi kurtî ev in.

Fehmîyê Licî li Kurdistanê endam û nûnerê komela "HÊVÎ" bû. Ya ku di sala 1912 an da li İstanbulê hatibû sazakirin. Her hejmara kovara "ROJÎ KURD" û paşê jî ên "HETAWÎ KURD" jê ra di

Dr. Fuat, Bavê Tûjo, Fehmîyê Licî û Fikrî Efendî li hev dici-vin. Li ser rewşa Kurdistanê, xasma li ser hereketa Şêx Mehmûd Berzencî dipeyi-vin. Paşê Qedîr Cemîl Paşa dixwaze ku ew di nav xwe da peşk bavêjin, Peşk li kê keve, ew here Suleymaniye bi Şêx Mehmûd ra bipeyive, rewşa wî baş fam bike û pêra têkilî deyne. Wê demê Fehmîyê Licî xwe dide pêş û dixwaze ku ew bê peşk bi xwestina dilê xwe here wê wezîfê bicî bîne. Lî ên din taw nakin, di nav xwe da peşk davêjin, peşk li Bavê Tûjo dikeve. Mixabin, dema Bavê Tûjo çû ku derbas bibe here Suleymaniye İngilizan destûr nedanê û paşê wan ew girt teslimê Tirkân.

Têkiliya Fehmîyê Licî û Te-yip Eliyê Xarpêtî Bi Şêx Seid û Xalid Begê ra geleks xurt bû. Di 1919'an da Fehmîyê Licî



Evin 1925'a de li Bexdayê hatiye kîşandin. Yê rûniştî. Şêx Eli Riza kurê Şêx Saîd Piranê. Yen şîpiya: Ji cepê ber bi rastê: zabitê Kurd Xurşid Efendi, Fehmîyê Licî, Tewfîq Efendi, İhsan Nûri (Paşa)

hat, wî jî ew li gel belav dikirin û dixebeitî ku ji "HÊVÎ" ra kesen alîkar peyda bike.

Di 1918 an da dema komela Pêşketina Kurdistanê bi arî-karî, xebat û xîreta Ekrem û Qedîr Cemîl Paşa li Diyarbekirê hat sazakirin, yek jî ji sazker û endamê komelê Fehmîyê Licî bû.

Fehmîyê Licî Hem endamê komela Pêşketina Kurdistanê bû hem ji endamê komîteya propaganda Pêştabirina Çand û Wêjeya Kurd bû, ku ev komîte ji aliye kargerîna komelê ve hatibû hilbijartîn. Komîte ji van sê kesan pêkhatibû: Bavê Tûjo, Cemîl Beg û Fehmîyê Licî.

Vê komîte ji bil karê ku jê ra hatibû dayin, nîvisarên "jinî" teksîr dikir û hinan jî werdigerandîn Kurdi û li gel belav dikirin. Karê wergerandinê bi piranî Fehmîyê Licî dikir.

Rojek min ji Apê Fehmî weha pîrsî:

—Apo li gor gotina Ehmet Begê Kudê (birayê Xalid begê Cibîrî) û Şêx Elîrîza pêşni-

jî bi derewên dijmin hatiyî xapandin.

Wî wê demê axîn kîsand, berçavikên xwe deranî, paqîj kir, dîsa danî ber çavê xwe û weha got:

—Kî dibêje bila bibêje. Ev derewa dijmin e, kirine benîşt û dicûn. Hinek bi nezanîn hînek jî bi zanîn vî benîştî dicûn û hinek jî ji bo ku rûreşiyê xwe veşîrin meselê serobino dîkin û vajî nîşandîdin.

Belê Şêx Seid şêx bû û gelek jî oldar bû lê bi tevî vê jî neteweperwerîya Şêx Seid ji oldariya wî gelek girantîr bû û Şêx Seid neteweperwer û wela-tparêzekî mezintirîn bû.

Eger Şêx Seid ne neteweperwer ba cawa ez dikirim sekreterê xwe; ezê ku di nav gel da bi fermasotiya yanî bi bêbolî û Xwedênenasiyê dihatim naskirin.

Dûmahîk hêjmara bê de

yaza Şêx Seid a ji bo rîzgarkîrina Kurdistanê ji Seyid Evidilqadîr ra biribû İstanbulû.

Ü li gor gotina Eli Heyder Begê Vartoyî (İleridikmen) di 1924 an da li Vartoyê di mala Eli Heyder da te bi hin serken xîlîn Kurdî Elewî ra ci-vîneç çekiribû. Tu dikarî di derheqê van her du meselan da hin hayîdarî bidî min? Tu bersiv nedî min tenê weha got: "Belê, lê bila nuha bîmîne."

Çend hîfte paşê rojekê ji min weha jê pîrsî:

—Apo dibîn Şêx Seid gelekkoldar (dîndar) bû doza wî jî her tenê olî bû. Gelo ev rast e?

Bi hîrs weha got:

—Gere min ev pîrs ji te ne-bîhistâ. Lî tê xuyakirin ku tu

Bîranînê Generalektî Tîrk

- 9 -

Cemal Madanoğlu
Wergê: Alîşer

min vi karî şîdand.

Rebihustek toz in. Min pêşîya gera Alfons a bêgiranî girt. Bi-la erebê hedê bajo û toz û tebarê têkîlîhev neke...

Alfons hat ditina Fermanberê Taburê. Guherînê ku min pê-karnin, cû xweşa Celal Yuzbaşî. Dest pê kir û hin nêzîtir dan û sitindînê bi min re danî, giramiya min zêde bû. Fermanber.

—Bijî... digot.

Heşeskeren inzîbat hebûn. Min ewan bi awakî bi ser û ber, da gerandin.

Hedîsek dernakeve.

Min dest pêkir der û li doran gerîyam...

Dixwezim ji gişlî derkevîm. Min xwest ez malekê bigrim. Cî-yekî yekode min dît. Mehî bi du mecidîye kîrî.

Perê kaxiz a dewletî, li Dîclê derbaz nabe. Sêra parên kaxiz ên yek paqnot, her roj diguhere. Di eslê xwe de perê zîv derbaz dibe... Ji bo perê kaxiz rojekê 19 quruşan didin, roja din 21 qu-rusa.. Ev sêra (piyase) han çawa pêtê? Azînê sêra peran çye? Ez nizanim. Lî, dan û sitindîn bi quruşen ziv dibe. Jina aborî a Cizîrê bi vî awayî ye...

Cizîr germ û germîyane..

Her roj pişî nîvî em çend serbaz, li ciyekî bi sî rûdinin... Em ji xwe ve diçin. Mecala me a axaftinê namîne. Roj li ser se-re me... Bê deng dimînin. Em qasekî wisa disekin... Bê azaftin...

Yek ji nav me hêdîka radibe, dismala xwe ji bêrika xwe derdice. Girêkekê li serî dismalê dixe. Piş re dismalê di nav destê xwe de vedişere, bê ku girêkê bide nişan, her çar çimên dismalê ji destê xwe derdice derve. Em gişk, her yek ji me, em çimekî dismalê digrin lî dikişin in. Wexta em çimên dismalê dikişin, çimê ku girek lê hatî dan, di destekî de bimîne, ew kes ji berika xwe quruşek dirdixe û datine ortê.

Li ser vê serbazê listîka dismalê dike qîrîn:

—Hesoooo...

—Di navbera me û çemê Dîclê de rasteke şêst-heftê mîtroyî heye. Cî cî qamîs ji nav erdê pekiyane derive.

Wexta di ser re du-sê daqîqe derbaz dibe, serbaz dîsa bang dîke:

—Hesooo...Hesoooo...

Di ber re Heso dirdikeve û li vî milê dinêre; paş de vedigere tê. Di ser re nîv seet derbaz dibe, bi kerekî ve tê. Li ser pişta kerê meşkek heye. Di destekî Heso de devê meşkê û di destê din de jî meşrefekî ji kundirê (kabak) avê. Heso bi vê meşrefe, ji ava Dîclê meşk tije kîrî.

Heso, ciyê ku em lê rûniştine, bi barek ava kerê bi rind û xwe-şik dike û quruşê ziv distîn e...

Wexta ax tê avdan kelxûyek germ jê hiltê.

Hinekî bîna me tê ber me.

Pişî du seetîn din, em listîka xwe nû dikin...

Jiyana me gelek sekinokî ye.

Rojek ez di qeraxen Dîclê re dimeşim.

Wê wextê di ordîyê de rîxistina gumrukê hebû... Bi navê Gâlip, yuzbaşiyekî Gumrukê li Dîclê bi wezife bû.

De gera xwe a bi ponîjîn de, min dengek sehkî:

—Zeptiye..zeptiye...

Ez zîvirîm û min lê nêrî.

Zeptiye di şûna cendîrma de dihat bikaranîn.

Lî, ez ne cendîrme me ku?

Galip:

—Tu çava berpirsiyare serbazan î, haya te jê tune ku poste hatiye.

Nebê ku, ez ji bo "Mulhakkî a cendirmê Bajarê Urfayê,, hat-time teyîn kîrîn. Wê wextê General Kazim Orbay bibû fermanberî gişî a cendîrman. Bi piranî serbazên cendîrman, di eske-riya ewilîn de dihatin gehîştin. Ji wan re "gihiştina di centê" de dihat gotin. Kazim Pasa, ewan gişkan teqewut kiribû, li gora gotinawan rojan de nav cendîrman de têkuzyek nû çedîkir. Di wê nabînê de, ji bo hellâ kêmâsi ya serbazan, ji ordiyê her sal 300 serbaz digirt. Ev serbazan han, sê sal li serhev cendîrmetî dikirin û piş re dîsa vedgeriyan ordi yê.

(Dom dîke)



Hevkariya Civaka Ermeniya û Kurda

- 9 -

KARLANÊ CAÇANI

Hukumeta Tirkîyê dinerî ku vê yekê jê re li hev nayê, wê carê destê xwe avêt beg, axa û şexan izin û nusxeting mezin da wan bi fêl bazi û bi destê zêra ew kîşandin alî xwe û dîvî bê gotin ku ji hukumetê ne lihev hat ku bi desten hinek beg û axa, di hinek qezayan de Ermenî û Kurda derxe hemberî hev, lê di esasi de dokumenten dîrokî ditin kîş, ku Kurd û Ermenî dosten hevûdu bûn, civaka xebatkar (zehmetkîş) nehatiye xapan-din. Profesor V. Parsamyan di de kîş: "Ku civaka Kur-

dan a xebatkar her tim Ermenî dihewandin ew bi hev re di nav aşîfî de bê şer û doz dijîyan û dixebeitin" (46) Rojnama Ermenîyan "Mêxû Hayastanî" ji sala 1880'î dîni-vise "Herkes rînd dixwaze, ku gîlî û gazinên civaka Ermenîyan re li hemberî çend cerîbîşîn Kurda ne, lê di esasi de li hemberî beg û şex-în Kurda ne. Ew beg û şex-, ne civaka Kurd in û tucarî ji nikarin bibin civak. A. Nastin, siyaseta wî çaxî gunehkar e, ne ku civaka Kurda" (47) Xudaneki mayin jî dinivîse

ku: "Civaka Ermenîyan û Kurda ya xebatkar, her tim ji hev re pak bûn, di nav wan de tu caran dijiminayi tunebû" (48)

Rast e. Hukumeta Tirkîyê riya qirkirina Ermenîyan dâbû ber xwe, lê her wiha ku si-yaset ji destê xwe bernedida ku Kurda ji têke roja Ermenîyan. Ne axir ew herdu civak, di hundurê welat de, li hemberî hukumeta Tirkîyê hesab dibûn qewetir zor. Tu carî ji dîrokî nayê paqîjîkirê û heta heta wê bê gotin, ku gava di destpêka sala 1934 an de, di

Kurdistanê de hêjandinê ci-vaka Kurdan destpêde û Mehmûd Reşîd Paşa pê dihe-se yê ku teze ji Misrê ji şerî li hemberî Mehemed Eli vege-riyabû derbasî Kurdistanê bû û Kurd di nav xwînê de qirkir. (49)

Agirê Sînema Amûdê

Ehmed NAMÎ



Kitêba M. Ehmedê Namî ya bi navê "Agirê Sînema Amûdê" di van rojêne pêşîya me de, wê di nav weşanên Jina Nû de derkeve. Kitêb rûda-nek tarixî ya civaka Kurdi derdixe meydanê, ji windabûnê xelas dike.

Bi vê rola xwe, karekî gelekî hêja ye.

Em li vir, perçekî ji wê çap dîkin.

Navê film wê rojê; "Gune-hâr-kariyê Nîvê Şevê" bû. Nave-kî bêqidoş bû, bêqidoşya wî ji nav û nişana ï dîhate zanîn.

Di wê seetê de xwendavan wek pêlêne derya ji kêfxwesi û nêzîkahiya destpêka film li hev diketin. Lê wan jî qet bawer ne dikir, ku ber bi mirinê ve diçin û dawiya jîna wan e. Ji lewra wan jî xatirê dawî ji dê û bavê xwe ne xwestibûn mîna herdu zarokên sêwî. Ewan xatirê dawî ji diya xwe ya dilovan xwestibûn û ji nû ve hatibûn.

ZENGILÊ SÎNEMÂ

Seet bû heftê êvarê. Pir ne bûrî bi awaz û deng bû cingin û zinginâ. Zengilê sînemê. Xwendavan her yek ji cihê xwe êrîş bire sînemâ. Di deriyê yekane re, deriyê teng û tîrs, cote cot bi zor di ber hev re derbasî hundir dibûn. Edî ne hewce ye ez careke din pesnê derî ji we re bidim.

Weharengi bi xir û cir xwendavan hemû ketin sînemê. Lê di hundir de halê wan bû ci, nizanim.

Di wê gavê de zana û bîrever di nav wan de ne bûn, ku ne-razîbuna xwe ji berpîrsiyarê sînemâ re bidin nişandan, ji ber wî cihê teng û tal. Eger dilsoj û xemxwarek hebûna, bê gûman ew ziyana mezin çenêdibû.

Hikim berdi berdayî bû. Ke-si guh li kesî ne dikir, berpîrsiyar ne dihatin naskirin. Te-nê çend mamotoñ biyanî, ne yên dibistana Xezalî û Mute-nebî û cilvazekî belediyê yê ku bi zarokê mudirê nahiye re hatibûn, cihê wan xwes û fe-reh bûn.

Xwendavan dîsa di gel wê tengayî û nexweşiyê, bi dilşa-dî çavmîriya vemirandina ro-nahiye û milamîma perdê ji ser ruyê şasa sipî dikirin.

Paşî derî hate girtin bi "çil hejê guhî jî" bi destê mirina bêbext û sitemkar.

DESTPÊKA FİLM

Deng ji zarokan hate birîn, hêdî hêdî perde ji rûye şasa

sipî hat hilandin û film des-tîpêkir weke carên berê. Tîr-jîn ronahiyê çûne şasa sipî. Pişî ku hinek ji film kete ber çavan û derbas bû, ji nişka ve yekî bi dengê bilind kire gazî û got:

-Hewar e gelî zarokan û xelkê sînema, bazdin, bire-vin, sînema şewî!

Pê re pê re dîtin, ku tîr-jîn ronahiyê hatin guhertin bi tîr-jî sorî agirî. Ji nû ve hemû-yan bawer kirin, ku sînema dişewite, û ew deng û gazî dengê peykê eccl ye.

Edî her yek ji cihê xwe rabû û êrîşî devê derî kir da bireve û xwe ji mirinê biparêze, xi-las bike.

Berî herkesi mamoste û cil-wazê belediyê yê bi zarokên müdür re hatibû, bê zehmetî di devê derî de derketin û ez bawer im wan qet agir nedîtin wek ên mayî. Çiko dema wan dengê şewatê bihist, hêdî hê-dî derî vekirin û bê zehmetî derketin. Li dû wan ci kesen kursiya wan nêziktirî derî bû, ew jî bi xwesî derketin.

Dema agir hinekî dijwar bû, bi çavê tîrs, her yekî tîrsa ji tîrsa şewatê û agir dixwest xwe bîghîne derî û xwe ji mi-rinê xilas bike. Bîste bîst da-ne ser hev, bi ser hev de bûn kom û derî hate girtin. Paşî hinekan xwe ji locê de pence-ra re avêtin û hinekan ji pen-cera yekena di dîwarê jêrî yê sînemê re xwe avêtin derve... Lê sed heyf û mixabin ku li wî jî mirina bextres daf û qoçen xwe li ber dijwarê jêrî, li hember pencera nûvekirî veda bûn. Li ber wê bîr hebû û deriyê wê vekirî bû. Gelek zarok dema xwe di pencerê re davêtin derve, yekser diketin bîrê, ew bîra ku me go li ber dijwarê sînemê yê jêrî bû. Wan pê nizanîbû, ê zanîbû jî, çavê tîrs bû, nedihat bîra wî.

Dema xelkê bîhist, ku zarok ji pencerê xwe davêjin derve û dikevin bîrê, ji çar aliya êrîş birin devê bîrê ji bo deranîna zarokan. Ji wan jî hin sax hin mirî tanîn der. Ên ku di sînemê de mabûn ji dûkel û pêtîn

agir, derî û pen-cera li ber wan winda bûn. Edî bazdan û rev bi dest wan nedîket û ne dighan derî. È ku dîgha jî di derî de asê dima.

Pir nebûrî den-gekî bi tîrs û gurmîneke xurt ji hundirê sînemê hat. Bingeh û dîwarê wê hejîyan, te digo belkî bom-beke atom di hundirê sînemê de teqiyâ.

Li duv teqînê agir girte ser û binê sînemê û ji pêlên dû hun-dir tarî bû... Pêtêne agirî sor û şin, çar alî, çep û rast zarok li hev vedigerandin. Çendî gazî hewar dikirin bê fêde bû. Ge-lek dê û bavê bextres ji wan bê guman bûn, newqî derya xef-letê bûn. Di wê gavê de xe-berdarekî dilsoj mîna Gurgîn nebû da ku xeberê bîghîne Tacdîn. Ji lewra gelê Amûdê ta ebed sergerdan û jar û xem-gîn maye:

Dilo jaro ji xew. rabe Ji derdî milete xemgîn Me Tacdîn û Çeko nînîn Xeberdarê me bê Gurgîn Hin bi hin pêtîn agir dijwar û blînditir dibûn, rengê şipa aş di derî, kulek û pencerê re tavetin. Kesî nema dikarîbû nêzîk bibe, yênhî dihatin, didi-tin, ku agir bi wî rengî ye, na-çar disekinîn, mîna Zerdeştiyan li dor agir diçûn û dihatin û didîtin bê çawa pêlêne agirî sor û şin bîste bîst, çile cil xor-têni ciwan di kûrangiha sî-nemê de didin ber singen xwe.

Weke rifdekk gurê Kanûna, bîrçî bikeye koza berxa ya bê şivan û bê xwedî. Ji wan hin diketin û ranedibûn û hin ra-dibûn dîsa diketin. Bi yek dengî digitin: Yadê... Ya-bo... Hewar e... Ez şewitîm, ez perîtim. Bi yek rengî qêrîn û hewara wan, di nav pêl û pê-tîn agir de bi rengekî mûsîqa awaz û deng dida. Lê yadê û yabo, xwîşk û bîra, metik û

xaltîk, ap û xal, pîsmam û dotmam ji wan dûr bûn û den-gê wê mûsîqa bi şewat ni-dikirin.

Metelok dibêje: "Xwedîyê talanê dengê hewarê nake."

MIHEMEDÊ XWA LÊ XWEŞI

Dibêjin hêj destpêka agir bû, lê hin bi hin pêtîyên wî dijwar dibûn. Koma adem-i-zadan hewara agir, jin û mer li hev sitûrdibûn.

Me di ji wê koma bêjimar xorkeki ciwan û hêja, huner-mend û canpolâ, mîrxas û xî-retşînas; "MiheMEDÊ kurê Seîdê Deqorî" derket. Pey-wend û zincîrê jîne qetandin, weke şereki xeyidî û teyrekî bazî ku xwe berde ser nêçîrê, êrîş berda kûrangiha agir, kû-rangiha mirinê; hundirê sînemê, ta ku gihîşt zarokan û ji wan dido dan bin çengê xwe û anîn der. Cara duduwa dîsa êrîş hundir kir û du zarokên din anîn der.

Bi vî hawayî êrîş li dû êrîş-e ta ku donzde zarok ji kûrangiha mirinê, ji nav pêlêne dojehê anîn der.

Lê sed mixabin, di êrîşa ca-ra dawî de agir girte cil û canê wî.

Ji ser ta bi qedem ew jî bû pêtek agir û sînemâ bi carekê de hilweşîya, bi ser wî û zaro-kên mayî de hate xwar. He-dan neket canê wî ta ku bû qurban ji bo lawanê mîletê xwe.

"EZ DÎBÊJIM SWËDÎ BAŞTIR E..."

Zinarê XAMO

çerdeh" qet pê xwes ne hatibû. Qey lê-wîl jî fahîr kir tiştî di pirtûkê de ne bi dilê bavê wî ye, loma jî got:

- ya, min ji te re ne got...

Bavê bi dengekî melûl got: "Hela ka ALFABE' xwe bide, gelo ew çawa dîni-vise." Lê Alfabe yê tew halê bavê xirab-tir kir. Wê jî (Alfabâ M. Emin Bozarslan) hin jîmar ne wek momsta, ne wek pirtûka "Em Binivîsin" û ne jî wek bavê nîvîsandibû. Di Alfaba M.E. Bozarslan de "didî, sî, pêncî", di pirtûka "Em Binivîsin" de bi şiklê "dido, sîh, pêncî" hatibû nîvîsandin. Edî tu qupal ku bavê pê bigirta nemabû, mecbûr ma ku van gotinê jîrîn ji lawê xwe re bibêje:

-Lawê min rast e, mamotoñ te ji te re bi hawakî gotiye û pirtûka te jî bi hawakî din dînivise... Lê belê tu li bavê xwe guhdarî bike. Em li mal çawa diben tu ji wer bibêje. Bixê kinga tu mezin bû wê çaxê "devoka" pirtûkê û a mamotoñ xwe jî fêr bibe. Nuha ya baştir ewe ku tu pirr tehev neki, bira "devoka" me ji me re be û wan jî ji wan re...

Azad: Bavo, (Bavê got ha!) Ez dibêjim Swëdî baştir e; pirtûk jî, mamotoñ jî û zarok jî giş wek hev dibêjîn: "en, tvâ, tre..."

Ma nizanim, Azad neheq e gelo?

Di Otoboza Diyarbekrê de

Mêrik li diyarbekrê di otoboza belediyê de bi zimanekî nazik ji yê kîleka xwe pirsî:

—Begefendi, ez dibêm qey tu zabit î (subay) ?

Yê kîleke şas ma:

—Na begefendi, ez ne zabit im.

Kwediye pîrsê bi nazikî carek din da ser:

—Baş e, begê min, lê birayê te, bavê te, ya jî di nav malbatâ te de ma qet tu kesê zabit tune ye?

Yê kîleke ji van pîrsan pir tiştî fahm ne kir. Lê cardin jî dest ji nezaket û kibariya xwe berneda û got:

—Na heyra, na; ji me tu kes zabit tuneye.


—Dibê tu baş bidî bîra xwe, yanî xwediye xaniyê te, idare-ciyê apartmana we, hevalen te yên dibistânê, ya jî di nav cîranê der û dora mala we de ma qet kesî zabit tuneye?

Yê kîleke edî hew debar kir, bi carkê de pê de teqiyâ:

—Na hayra, na; ev bû çend car ez ji te re dibêjim na.. Ne di nav malbatâ min de û ne jî, ji cîranê min, tu kesî zabit ma-bit tuneye...

Wê çaxê mîrikê me hîn bi dengekî bilind got:

—È ker lawê kerê, nexwe wisa ye nigê xwe ji ser nigê min rake, ev serê seetekê ye ku tu pê li nigê min dikî...



2 Adar 1925 : Hêzên Şêx Seîd dora Diyarbekirê girtin

2 Adar 1979 : Mistefa Barzanî çû rehmetê

4 Adar 1925 : Li ser bûyera Şêx Seîd "Qanuna Takrîr-î Su-kûn" hat derxistin

5 Adar 1925 : Hêzên Şêx Seîd Xarpêt (Elezîz)'e rizgar kirin

6 Adar 1921 : Destpêka Serîhildana Qoçgîriyê ye

6 Adar 1975 : Di nav İran û Iraqê de Peymana Cezayîrê hate ûmzikerin. Li gor Peymanê İranê alîkariya ku di-da tevgera serokatiya Berzanî birî, Iraqî jî li hindî da delava Basrayê hinek ax da İranê.

7 Adar 1919 : İğilîza Ruha (Urfa) yê işxal kirin.

8 Adar 1963 : Baasiyan li Süriyê derbe çêkirin, hatin ser hukum.

11 Adar 1970 : Hukumeta Iraqê û Partiya Demokrat a Kur-distana Iraqî li ser otonomiye li hev kirin, pey-manek hat ûmzikerin.

12 Adar 1971 : Li Tirkiyê leşkeran dest danîn ser hukim, zulm û terorek mezin li Kurdistanê destpêkir.

12 Adar 1974 : PDK-I rexne li pêşniyara hukumeta Iraqê ya nû ku li ser otonomiye anîye, girt.

13 Adar 1921 : Li ser serîhildana Qoçgîriyê hukumeta Tîrk li Sewas, Erzîcan, Xarpêt(Elezîz)ê urfî-idare ilan kir.

13 Adar 1921 : Hêzên serîhildana Qoçgîriyê ketin Kemahê.

13 Adar 1936 : Têkôserekî rizgariya Kurdistan Xelîl Gosawî hat kuştin.

14 Adar 1903 : Mustafa Barzanî li mintiqâ Barzan hatiye dinê.

14 Adar 1979 : Mustafa Çamlîbel yek ji têkôserekî PSKT li Agiriyê ji alîyê Apociyan ve hat kuştin.

15 Adar 1932 : Serîhildana Barzaniya ya yekemîn li Kurdis-tana Iraqê destpêkir.

16 Adar 1978 : Milîtanê PPKK, Hamît Akil û pênc şoreşer li İstanbul, li ber université bi desten faşistan şe-hît ketin. Faşistan bombe avêtibûn nav xwen-devanan.

19 Adar 1925 : Xalid Begê Cibrî, Yusuf Ziya û 20 têkôserekî Kurd li Bedlisê hatin darvekirin.

19 Adar 1986 : Endam û têkôserekî jêhâtî yê PPKK, Xalê Cemal (Mehmet Sözer) çû rehmetê.

21 Adar 1976 : Kovara Rizgarî derket.


21 Adar 1982 : Berxwedana girtîgeha Diyarbekir

Cunta ji muxbîran re bi kulma pere dîbarîne Serê her şoressgerekî milyonek!

Fernandarê leşkerî yê Diyarbekir, bi darê zîlüm û zorê û kuştinê nikare rê li ber şoresser bigre, vê carê dixwaze bi milyonê xweyên xwînî bîghîje armanca xwe ya qirêj.

Fernandarê faşist ji bo ku karibe şoresser û welatparêzînê Kurd ên mehkûm bigre têx zîndanan bi kulma pere dirjîne. Heta niha ji bo 66 kesan ûlan hat derxistin, ku kî ixbara yekî ji van bike û bide girtin wê jî milyoneki ne kêm pere bigre. Li gor biryara hukmeta Tirk, girtina ji bo kesen mehkûm ên siyasi wê fernandariya leşkerî karibe serê her yekî ji milyonekê heta pênc milyonan bexşîsa muxbirîye bide. Fernandarê leşkerî ji li ser vê yekê, navê şoresser û welatparêzân li diwaran dixe, afişen wan dişine gundan û dide xuyakirin ku kî şoressgerekî bide girtin, wê ne ji milyonekê këmtir bexşîsa bide wan.

Lê heta niha, li ser vê yekê ku kesi' muxbirî nekiriye û kes nehatiye girtin. Eşkere ye ku milyonê generalan ji wan xelas nakin.



Afişek ji afişen fermandarê leşkerî

CİZİR:

3 Kurd hat qetilkirin.

Sê Kurden xizan ku debara xwe bi qaçaxiyê dikirin di hudûd de bi bêbextî hatin kuştin.

Di meha Çileye Paşa de M. Şîrîn Tanrıverdi, kurapê wî Huseyîn Tanrıverdi û yekî din ku heta nuha jî huviyeta wî nehatiye tesbitkirin, bi fermandarê bolika Baziftê (Kataran) re li hev kiribûn ku bi rûşwetî wê ji Kurdistanê Sûriyê derbasî Kurdistanê Tirkîyê yê bibûna. Gava derbasbûnê,

fermandar tevi leşkeren xwe wan di hidûd dê sekinandinê, perê ser wan ji wan stent û her sêyan gulebaran kir, dû re bi panzerê pelçiqant.

7-8 meh berî vê bûyerê du birayen M. Şîrîn Tanrıverdi, Abdullah û Tahir Tanrıverdi jî di hidûd de şehît ketin. Ev malbat li herêmê bi welatpa-

rezi tê nasîn. Hetta ji van bîrayan Tahir Tanrıverdi militâne hêzek Kurd; Partiya Pêşeng a Karkerî Kurdistan bû.

Ustegmen bi vê yekî jî nesekîn, pişti bûyerê malbata wan girt, 5 roja bi wan işkence kir. Nuha jî li ser vê malbatê zulm û tahde heye.

C. Rojen

Federasyona Komelên Kurdistan Kongra xwe ya 7'a çêkir



Wezirê Biyaniya George Anderson di kongrê de axafinek kir. foto: Armanc

Palme de ku lu ser Kurdan têñ kirin

sekînîn û piştigirî xwe bi gelê Kurd re dan nişan dan.

Beñ mîvanen Sevidî, ji her çar perçen Kurdistanê nûne-reñ gelek rîxistin û partiyen Kurdistanî di kongrê de hazir bûn û mesajen serfirazîye ji kong

rê re şandin.

Di roja dawiyê de ji bona Komîta Karger du liste hat pêşniyarkirin. Lîstakê 20 deng û listakê 27 deng girt û 10 deng jî vala derket. Ev carâ pêşen bû ku di kongrek Federasyonê de du liste derdikeve.

Li herderê haziriyê Newrozê.

Newrozek nû hat! Li hundir û derveyî welat haziriyen Newrozê têñkirin. Program têñ hazirkirin, xebatên folklorê, tiyatro, köröyê dimeşin. Li hundirê welat belavok, pûl anjî li serê bilindîya hazirîya vêxistîna aqirek gur... Li Kurdistanê Iraqê û Iranê pêşmerge bi oparasyonek hîn mezintir dixwaze Newrozê pîroz bi.

Li Almanya, Fransa, Holanda, Swêd, Belçiq û hwd. bi dahan

rêwan biçuk an mezin wê Newroz bê pîroz kirin.

Li Swêd; li Stockholm, Göteborg, Uppsala, Eskilstuna li Almanya, li Köln, München, Hamburg, Berlin û hîn bajaran din ji aliye komelên Kurdan hazirîya şevêñ taybetî têñ kirin.

Ji ber îsal 21'ê Adarê rastî roja şemîyê tê, wê şevêñ Newrozê yê li welatên Ewrûpa hîn bi girîşî hîn



Mihendisê Tirk di destê YNK de

- “Ji bona protestokirina girtin, hefs û işkencekirina bi pêşverû û welat parêzîn Kurdish me mihendizê Tirk revand.”
- “Hetanî ku Tirkîye vê siyaseta xwe ya hov û şovenîst bidomîne li her bihostek axa Kurdistanê Iraqê emê li wan xin.”

Seva 14'ê Sibatê pêşmergên Yekîti Niştanî Kurdistan (YNK) li nézi bijarê Silêmaniye li Pasulcê avetiñ ser fabrikak çimento. Li Fabrikê du mihendizên biyanî girtin; ji van yek Tirk (Atilla Çelik) û yek jî Alman e. Pişti ku ev xeber li cîhanê belav bû rojnamen Tirkîye li ser vê bûyêre gelek spekulasyon kirin, ji ber xwe derewê nemayê li hev gerandin û nîvisandin. Ji bona fêrbûna rastiyê û sebebê vê tevgerê me têkilî bi berpirsiyare YNK ê Stockholm'e re danî û li ser vê yekê infomasyon jê girt. Hevalê berpirsiyare sebebê vê tevgerê bi 4 nuxta rîzkar.

“Tirkîye, wek mîletekî hebûna gelê Kurd ïnkar dike û li Kurdistanê Tirkîye hemû maflî gelê Kurd yê netewî kultûri û demoqrâtîk bi darê zorê ji dest girtiye û li aliyê din jî zulm û zorek nedîti li gelê me dike. Yek, ji bo protestokirina van kîrînê Tirkîye. Dûdu, ji bona protestokirina girtin, hefs û işkencekirina bi hezaran pêşverû û welatparêzîn Kurd. Sisê, ji bona pro-

testokirina sürgûna gelê Dêrsim û Erzincanê. Çar, ji bona protestokirina hevkariya Tirkîye bi diktatoriya Saddam û êrişâ wan a ser Kurdistanê Iraqê. Pişti vê eşkerekirinê berpirsiyare YNK'ê axaftina xwe wiha domand: “Ü dibê ew baş bizinan, heta ku hukûmeta Tirkîye vê siyaseta xwe ya hov û şovenîst bidomîne li her bihostek axa Kurdistanê Iraqê ku menfeeta Tirkîye tê de hebe emê lêxin”.

Berpirsiyare YNK, li ser sebebê revandina muhendizî Alman jî bi kurtayî dîfîna xwe wa anî zimên:

Kurdistan welatê me ye, lo-

ma jî her şirketa ku dixwaze were Kurdistanê, berî hukûmeta Saddam dibê bêñ bi me re têkîlye deynin û destûrê ji me bigrin. Em dizanîn ku hin şirketên biyanî di bin navê projen iktîsadî de bi hukûmeta Saddam re xebat û alîkarîyen leşkerî dîkin. Ü ev jî li dijî menfeeta gelê me ye. Ü tîstekî din jî, iro iktîsada Iraqê bûye iktîsada herbê û dema li Kurdistanê jî sistemek iktîsa-

dî bê durustkirin perê ji vir bê wê ji bo herbê li hember gelê Kurd bê bikaranîn. Ji ber vê yekê jî her şirketek biyanî ji bo ku karibe li Kurdistanê bîmîne hîn projâ bidomîne dibê peymanê bi Yekîti Niştanî Kurdistan re çê bike.”

Rojnamen Tirkîye nîvisandin, ku berpirsiyare YNK yê Tehranê gotiye ku “dibê Tirkîye bi Mehdî Zana û İsmâîl Bêşîkçî re 200 girtiyen hevalen Apociyan jî berde”, li ser vê iddiyâye jî dîtina berpirsiyare Yekîtiye ev bû:

“Ev iddiya ne rast e, derew e. Me ne navê Apociya û ne jî navê hêzek din daye. Me doza berdانا hemû kesen şoresser, pêşverû û welatparêz kiriye. Bes li ser pirsikirina rojnameyanekî Tirk, nûnerê me navê İsmâîl Bêşîkçî û Mehdî Zana daye. Derî van her du navan me navê tu hêzek din nedaye.

Pişti revandina Mihendizê Tirk Atilla Çelik, di bin serokatiye General Kenan Evren de li Çankayayê bi Wezîre Derva Vahit Halefoglu û hîn wezîrîn din re civînek hat çekirin. Leşkerê Tirkîye yê li tuxübê Kurdistanê Iraqê bûye iktîsada herbê û dema li Kurdistanê jî sistemek iktîsa-

Mahkema cûntayê ceza li Mehdî Zana barand.

Di 24'ê Sibatê de Mahkema Leşkerî 15 sal cezayê ku ji ber endametiya rîxistîni ji Mehdî Zana re di xwest qebûl kir. Bê van 15 sala, ji bo “heqareta” li mahkemê, 8 sal û 9 meh û ji bo silehê jî sê sal cezayê din danê.

Ji bona ketina mahkema Mehdî Zana heyetek ji Fransayî çû Diyarbekirê. Roja mahkema Mehdî ew jî li wir hazirbûn. Pişti mahkemê di beyana xwe de gotin ku me ev yek ne di pa. E wê ji vê biryare re itîfrâz bikin ya ne kin, li ser vê yekê tu tişt ne gotin.

Heger ku mahkemê cûntayê hindawê din venekir, Mehdî Zana wê çar salê din bê berdan.

Almanya Federal

Li Hanoverê Gireveke Birçibûnê

Li Hanoverê di navbera 30.I. û 1.II.1987 de bi navê komîta aşîfîxwaz û demoqrâtîn Îranê gireveke birçibûne li dijî herba di navbera Îranê û Iraqê de pêkhat.

Komîta Pisgirtîya DDKD ê li Avrupa û dîlxwaten PPKK li Hanoverê bi mesajen xwe pişgirtîya xwe bi wan re xuya kîrin.

• UZIR •

Di jîmara berî, di nîvîsa “Burjuvazîye Tirk Faik Bûcak Kuş” de du çewtiyîn nîvîse bûne. Bavê Faik Bûcak, Hesenê Abîka, di nav parenteze de “Hesen Oral” hatiye nîvisandin. Rastiya wê, Hesen Oral ne Hesenê Abîka ye. Cardin, lawê Hesenê Abîka Faik kuş”, wê kuştin be.

N. Gezer

TATLISU:

DI HEFSÊ DE BI ZORÊ DERSÊ DÎNÎ TÊ DAYIN.

Li qeza Tatlisu'ye nîziki 20 gitî di hefsê de ne. Heroj bi zora Mudûrê hefsê dersen dîn didin girtiya û bêyî ew bixwazin wan mecbûrî ibadetên dînî dîkin.

Ev kar û “talîm” bi şeklekî sistematik lê ajotin. Dersen dîn her heste, mecbûrî 10 seet e. Her çiqas girtîyan dersen dîn; coxrafya, matematik, tebîti xwestin jî, daxwaza wan ji bal idara hefsê nehate qebûlkirin. Girti jî ji bo cezayê wan zû xelas bibe û zirat neyê ser wan dengê xwe bi xurşî ranakîn.

Ü tîstekî hîn ecêb ew e, ku li Tirkîye munaqaşa hebûn û tunebûna irticayê tê kirin.

ZOZAN

Edene: Grewa birçibûnê

Di 17'ê Sibatê de 61 gitîyên siyasi di hefsa Edene de ji ber sertîn pîrr xerab ketin girewa birçibûnê.

Kesen gitî roja dest bi girewa birçibûnê kirin nîvîsek dan berpirsiyaren hefase. Di ve nîvîse de dibîjîn ku ew, vê liberxwedanê ji bo protestokirina zulm û zora li wan dibî û jî bona sertîn ku ew te de dijîn biguhîrinin dîkin. Ligor beyana gitîyan; odan wan bi rutubet in, wan her roj dernaxin der ji bo ku bihna xwe vedin û nahêlin ku bi reheti serdenan xwe bibînin.

• Rastiyan du bûyeren li Uludere bûyî •

Yê qetliaman dike cunta bi xwe ye

K. Behreng

Cunta Tirk a faşist heroj provakasyonek li Kurdistanê dike. Armanc ew e ku vê tevgera rizgarîxwazîya Kurda ku roj bi roj xurt dibe bi provakasyona hêdi demek qels de bipelçiqine.

Bê şik we hemuya buyerâ 23'ye Çileye Paşa ku li gundê Uludere; Ovabax qewimî, bîhistîye. Berdewkên dewletê û çapa Tirkî vê buyerê kirin hustuyê PKK'ê.

Lê rastî ne wusa ye qetliamê MÎT û alîkarêne wê kirin. Berî qetliamê li mintiqê leşkeren Tirk û tîmîn MÎT'ê operasyonek umumî kirin. Seetek berî bûyeren leşkeren Tirk li dora gund bûn. Navarojê bombe avetiñ maklek ku li wêderê dawet çedîbe û dû re ji gulebaran kirin. 15 dedîqe, Pişti qetliamê leşkeren Tirk bariyan gund. Lê ci ecêp e yek ji wan jî rastî “terorîsta” nehatin!?! Dor li gund girtin û nehiştin yek ji gund derê û bi helîopteran jî mintiqî di bin kontrolê da hiştin, mal bi mal, qulik bi quâlik geriyan disa ji rastî “terorîsta” nehatin!!

Li ser vê yekê rojnameyanan ji fermandarê leşkeren herêmê pirsîn, “Tu kesek nehati dîfîn û tu delîl jî tune, hûn çawa dizanîn ew in”. Fermandar bi hêrs bersivî da; “Tu ci divê! Yanî em derewa dîkin. Hebe tunebe ji komunîstê Kurdan yek e, ew jî PKK ye”


Bî vî rengî dixwazin karen xwe yê xerab vesérin, ji xwe re mahna derxin ji bo li herêmê kontrola xwe li ser gelê me yê şiyarbûyi zêde bikin. Her wiha cunta faşist bûyerera beriya 8 meha li gundê Uludere Ormanaltı bûyerî ji kiribû ser Apocia. Derket, ku ev bûyer jî dewletê kiriye.

Hedise ewa bûye; leşkeren Tirk kirin nehirin gundîye Ormanaltıye nexwestin bibin milîs. Li ser vê fermandarê qomandoyê Erûhê, Ayhan ji gundiya re go; “ya hûnê bibin milîs, ya jî hûnê gund valakin”. Gundîyan disa ji milîsiyê qebûlnekirin. Li ser vê, leşkeren Tirk roket avetiñ nav zarokên ku li dora dibistanê dileystin; 8 zarok mirin, 5 zarok jî bîrîndar bûn.

Li ser vê bûyeren gundiyek ji Ormanaltıye arzualek da mudîsumûm û xwest rastîye beyanek, lê wî girtin û lêxistin. Gundiyen din jî xwestin çend car vê rewşê beyankin, lê her carê bersivâ distandin; lêxistin bû. Nuha dema miroj yi wan dipirse “hûn çima gazin û giliyên xwe nadomîn”. Bersiva wan e, “Emê giliyê kî bi ke bikin.

YEKEMİN KONGRA KULTUR Ú EDEBA KURDÎ CIVÎYA

- Kongrê, ji rêtixtin û sazûmanên hîndekarî yên dewleta Cumhuriya İslâmî daxwaz kir ku li gor maddeya 15'a ya Qanûna Esasiya Komara İslâmî ya Îranê, bira li heremê Kurdnişin (ciyêndi kurdî lê rûdinin) dibistan bi zimanê Kurdî ders bidin.
- Kongrê li ser, pêşdexistina ziman û edeba Kurdî jî hin biryaren hêja yên berbiçav girtin.



Bistikek jî kongrê

Yekemîn Kongra Kultur û Edeba Kurdî (Yekemîn Kongrey Ferhengî û Edebî Kurdi) di meha İlona (Rezber) 1986'an de li Mehabadê civîya. Kongrê ji bal Merkeza Belavkirina Kultur û Edeba Kurdî Weşanê Selaheddinê Eyubî (Nawendîy Belawkirin dinewey Ferheng û Edebî Kurdi, İntîşaratî Selahaddin Eyubî) ve hatibû hazirkirin. Wek têzanîn ciyê vê merkezê li Urmîye ye û bi navê "SIRWE" kovareke Kurdî derdice.

Gelek kes besdarî kongrê bûbûn û li ser jiyandin û geskirina ziman, kultur û edeba

Kurdî axaftinê hêja hatin kirin. Di dawiya Kongrê de li ser rewşa ziman û edeba Kurdi biryaren hêja hatin girtin.

Yekemîn Kongra Kultur û Edeba Kurdî, di biryarnama xwe ya dawiyê de da xuyakirin ku;

"...Maddeya 15'a ya Qanûna Esasiya Komara İslâmîya Îranê serbestiya dersgirtina ziman û edeba herêmî li tenişt zimanê Farisî eşkere kiriye..."

Loma Kongre daxwaz dike ku vê maddeya han ji bal rêtixtin û sazûmanên peywendîdar di vê meselê da li ber çav bêgirtin. Kongre amada-

niya anî, iro berê xwe daye Kurdan.


Hovîtiya dîkta....

Dêstpêk r. 1 an de

Lê li gor radyoya Swêd û ya BBC, berpirsiyaren hezên tevgera rizgarîxwaziya Kurdistanâ Iraqê vê idîayê redkirin.

Berpirsiyare Yekîtiy Niştimanîy Kurdistan ê Swêd da xuyakirin ku, li temamî herêmî hejmara Apocian nagihije 100 kesan, ji bo 100 kesan êrişik wiha hov û har û dijwar ne lazim û nabe jî.

Serokê Partî Demokratî Gele Kurdistan, Samî Abdurrahman, di beyana xwe ya ku



"Yekemîn Kongrey Ferhengî Edebî Kurdi" Mehabad

bûna xwe ji bo danîn û nivîsina her awa kitêb û defterên hîndekariyê di vî warî de dide xuyakirin.

Yekemîn Kongra Kultur û Edeba Kurdî, li ser jiyandin û pêşdexistina ziman, kultur û edeba Kurdî, pêşdexistina lehcen Kurdî û têkûz kirina zimanekî yekbûyi hin biryar girtin; jê çend heb ev in:

1-Ji bo jiyandina edeb û Kultura Kurdî divê hemû berhemî tarîxi, cografi, zimanî û folklorik bêne komkirin.

Her weha bi riya Merkeza Belavkirina Kultur û Edeba Kurdî; di bin çavdêriya kesen zana de karênu ku pêwîstin bi cih bînîn, û endamên konrê dê ji daxwaz bike ku ji bo bicihanîn pêkanîna van daxwazên jorîn birekî bigrin.

2-Kongre hurmeta mamosta HEMIN digre ku di kar û barê edeb û kultura Kurdî de gele kizmet kiriye. Her weha kongre gelek sipasî nivîskar

û birêvebirêne kovara hêja "Sirwe" dike ku di kar û barê edeb û kultura Kurdî de roleki mezin dilize. Em ji hemû kesen ku li ser Kultur û edeba Kurdî xwedi ray in û ji hemû xwişk û birayen Kurd daxwaz dikin ku li ser çi mewzûyi dibe bira bibe, hemû nivîsar û şîr û belgeyên tarixi ji me re bişinîn. Her weha ji bo naveroka kovara SIRWE hin baştır be divê herkes rexne û pêşniyaran xwe bişinîn û bi vê yekê alikariyê bikin.

3-Kongre ji bo yekîtiya zimanê Kurdî jî pêwîst dibîne ku li ser hemû zaravayen Kurdi û bi giştî li ser zimanê Kurdi lêkolin bêne çekirin, û ji bo vê yekê ji divê ji kesen zana û pisporan şûrayek bê çekirin, da ku bi karibin bîr û rayen xwe bigîhîn hev, li ser vê meselê hin hel û çareyan bibînin. Ji bo pêkanîna vê şûrayê û civardina kesen xwedî bîr û ray, İntîşaratî Selahaddinî Eyubî vî karî dide ser milê xwe.

4-Kitabê destnîvîsî yên Kurdî, ci kevn û yên şîr û folklorik bi kîjan zaravayî dibin bira bibin divê bê çapkirin. Dîsa divê ev yeka ji neyê jî bir kirin ku ji bo pêkanîna zimanekî yekgirtî, divê bi çi zaravayî dibe bira bibe, ji hemû kovar û rojnamên Kurdi feyde bê girtin.

5-Kongre rênûsa (sistema nîvîsî) ku nuha di kovara SIRWE da tê bikaranîn wek rênûsekî resmî qebûl dike û divê hemû kitab û kovar ji vê rênûsekî qebûl bikin.

Kurdistanâ Iraqê

Dêstpêk r. 1 an de distanî, dibê ev cephe di nav caphak Iraqi de cî bigre. Û bi vê hevkariyê her du hêzan jî qebûl kir ku qedera xwe bi destê xwe tayinkirin heqê gelê Kurde.

Li Tirkîyê jî 8 milyonî zêdetir Kurd hene. Tirkîye zane Iraqê vê tevgera Kurden Kurdistan Tirkîyê jî pêse bibe. A Tirkîye ji vê yekê ditirse û sedemî êrişî wê jî ev tirs e.

Serokê Meclisa Cumhuri İslâmî Iran jî çend roj berî êrişî Tirkîyê, beyanek da ku Tirkîye Dixwaze leşkeren xwe bi temamî têxe Mûsil û Kerkükê.

Ceylanpinar...

Dêstpêk r. 1 an de

bireve nav erdê mayinkirî Ez vê yekê qet fahm nakim."

Wek pîreka wî jî dibêje, pişti Ednan tê mal û meselê li gor beyana Suphan, pişti işken-cek 3 rojan hat kuştin.

Li gor beyana hêzen cûntayê, li nêzî gundê Ednan di bin erdê de çend şes derb hatine girtin û li ser vê yekê û nabêna "her du circib" a de operasyonek mezin çêbûye. Di vê operasyonek de bêyî Ednan û birêwî Mahmûd gelek keşen din jî hatin girtin.

Di navbera Partiya Komunist a Iraq û Yekîtiy Niştimanî Kurdistan de jî hevkariyek hat çekirin û li ser vê yekê beyan jî derket. Li gor beyanê PKI û YNK "gîhaştin baweriyek müşterek ku divê hemû hêzen dijî diktatoriya Sedam bîghêne hev, diktatori bê hilwesandin hukumetek demokratîk avabibe ku li Iraqê demokrasiyê û maflî meşrû yên milî yên gelê Kurd bi cî bike û rolek girîng di tevgera gelê Ereb a li dijî emperyalizm û siyonizm bilîze.

KONGRA PKS A 6'AN

"Silav li tevgera rizgariya netewî ya Kurd"

Di navbera 29-31'ê Çirîya Paşî da li Şamî kongra Partiya Komunist a Sûriyê 6'an çebû.

Kongre li ser bûyerên derveyî û hundurî sekînî, munaqeşe kir. Di vê navberê de Kongre silav li tevgera rizgariya netewî ya Kurd kir. Ev cara yekemîn e ku PKS bi awakî resmî û di kongrekê xwe de li ser gelê Kurd û problemen wê radiweste. Silavnameya ku ji aliyê Kongre ve jî hatiye gebûlkirin ev e.

"Kongra PKS 6'a ku di navbera tarixa 29-31 çileye Paşî civîya ye, slavên xwe pêşkeşî tevgera rizgariya netewî ya Kurd dike ku ji hêzên cûr bê cûr pêktî silaw li têkoşina wan dike ku li dijî emperyalizm, siyonizm û paşverûti-

yê, ji bo aşitiya dinê û ewlekariya gelan e.

Kongre, baldikşîne ser tevgera gelê Kurd û tevgera gelê Ereb ku ji bo rizgariya netewî têdikoşê û her wiha baldikşîne ser tevgirêdana dîrok û pêbawer ya navbera tevgera rizgariya netewî ya Kurd û tevgera rizgariya netewî ya Ereb.

Kongra me bi dijet guh da mesajên gihiştin me ji hêzên jimare vê tevgera rizgariya netewî ya Kurd. Kongre spasen xwe pêşkêşî vê piştgiriyê dike ku bi partiya me re dibe. Ev mesajên han piştgirî ye jî bi xeta Sûriyê ya dijî emperyalizm û dijî siyonizm.

Belavoka dawî ya Kongrê jî cî da tevgera rizgariya netewî ya Kurd.

RAXISTINEK BI NAVÊ "KURDISTAN DIJÎ" LI BAJARÊ CELLE VEBÛ



Komela KKDK li Celle û Arbeiterwohlfahrt li Celle bi hev re li pirtûk xana bajarê Celle (Almanya Federal) di 17.01.1987 de raxistinek (sergiyekî) bi navê "KURDISTAN DIJÎ" pêkanîn.

Vekirina raxistina "Kurdistan Dijî" ji alî mebûsî Partiya Sosyaldemoğrat (SPD), Dr. Frîtz Riege ve bi axaftinek pirr hêja û delal hate vekirin. Hevalbendê gelê Kurd Dr. F. Riege di axaftina xwe de bi kûrtî li ser dîrok û çanda Kurdistan a dewlemend sekînî û behsa perçekirina Kurdistanê na ñâra çar dewletan de û têkoşina Kurda li dijî vê yekê kir û got, ku Kurd dixwazîn dewletek serbixwe ya netewî çekin. Ew li ser pîrsen kurdên li Almanya Federal yên ku 350 hezarî zaftir in, mijûl bû.

Di pey axaftina Dr. F. Riege ve dengbejê Kurd Dilwar bi tenbur û dengê xwe çend dilokên geleri û folklorî pêşkeşî mevanê raxistinê kir.

Piştî dawiya raxistinê, mîvan bi hev re li raxistinê gerîyan. Rojnama bajarê Celle li ser malzemîn raxistinê, kuvana cûr bi cûr (weki dîroka Kurdistan ji beriya çebûna Isa heta iro û têkoşina gelê Kurd, jiyanâ Kurda ya sosyal, kultur, û literatur, dewlemendîya Kurdistan, rewşa pîrekan û zarakan, zîndan û lîdan û h.w.d) li ser vebûna wê û axaftina Dr. F. Riege rind nîvisand û runiştvanen bajarê Celle daweti dîtina raxistinê kir.

gon, barbarîyen nîjadperesten Afrîka Başûr, celladîyen Humeynî û yên din jî bêna rawestandin.

Hevkariya Civak...


Dêstpêk r. 4

de, xwîna bi hezaran mîrivên bêşûc û xebatkardihat rêtîn, şûrê Roma Reş dikir çîngînî û li ber tu tiş nedisekinî, wê bi vî awayî gelekî bajota, heger dest bi şerê Rûs û Tirkîyê yê sala 1853-56'a nebûya. Wî çaxî, firset ket destê serokê serîhildayan ê Kurd Êzdanşer ku li hemberî Tirkîyê dest bi serîhildanê bike. Berî serîhildanê, wê her wekî di nava Kurda de, di nava Ermeniyan de xebateke mezin kiribû. Ji bo vê yekê jî gava serîhildanê dest pêkir, hejmara serîhildayan hema ji roja pêşin de gihaşt 30 hezeran.

Sala 1855'a di meha Çilê Paşî (Ocak) de Êzdanşer Betlis û Mûşê girt, nûnerê hukumeta Tirkîyê ji wir qewirand û zavod () a topa hilanî. Li wir Kurden Êzîdî, Ermenî û Asûrî jî tevî serîhildayan bûn.(52)

Hukumeta Tirkîyê ji vê yekê gelekî tîrsiya, dit ku Ermeni jî digihîjin Kurdan û serîhildanê çiqa diçe hevqas zortir dibe, biryar da ku bi ci riyê dibe bira bibe, ji heqê vê serîhildanê derkeve. Hema wê çaxê ferman da paşê. Bexdayê

Kêngan, ku bi leşker êrişî ser Êzdanşer bike. Ü bi vî awayî, di nabêra serîhildayan û leşkerê hukumetê de dest bi şerîkî giran bû, sala 1855'a meha çilê Paşî li nik bajarê Sérte leşkerê hukumetê pelixî, serîhildayan bajarê Çataxê û çend bajarên mayîn û biçuk girtin.(53)



JİNA NÜ
Förlaget
P.Box 240 12
750 24 Uppsala
SWEDEN

Heykeltraşê Kurd KOSRET CEMAL

Pirs: Kak Kosrat tu dikarı ji bo xwendanen Armancê bi kurtî behsa jiyana xwe bikî?

Bersiv: Navê min Kosrat Cemal e. Di sala 1965'a de li bajarê Koyê ji diya xwe bûme. Min xwendina xwe ya seretayî (ilkokul, dibistana pêşin) û navendî (ortakolu, dibistana navin) li bajarê Silêmaniyê xelas kir.

Pirs: İnteresa te ye li ser heykeltraşî û resamîyê gelo çawa çê bû?

Bersiv: Gava ez zarok bûm meyla min li ser huner hebû û bi taybetî ji bi alî nîgarkêşî (risim çêkirin) ve. Piştî xelas-kirina dibistana navendî li Bexdayê ez çûm Enstituya Hunerî. Di sinifa duduyu de meyla min çû ser hunerê peykertaşî (heykeltraşî). Lê di

sinfia sisiya de min peykartashî di jiyana xwe de kir rîba-zek û li ser vê dersê min îxtî-sas çekir. Û di sala 1980'î de min înstîtu bi dereca yekem xelas kir. Di dûr re li sancaqa Derbendîxanê ez bûm ma-mostê salekê piştî ji li Silêmaniyê li înstîtu Hunerî di besê peykartaşî de bûm mamoste.

Ez di gelek pêşang yên (ser-gî, raxistin) Kurdi de besar bûme û bêyî van jî min du pêşanga li bajarê Silêmaniyê ve kirine.

Pirs: Di diroka Kurdi ya kevnare de heykeltraşî ci ciyi digre û tesîra wê li ser pêşve-cûna civaka Kurdi ci ye?

Bersiv: Bi daxewe ez dikarim bibêjim ku hunerê peykartaşî di dîrokê de li Kurdistanê ro-

lekê pirr mezin ne lîstiy e. Û ew peykertan ku berê hebûn dîroka wan jî hîn baş ne xuya ye. Ji aliyê din jî tu tiştekî berbiçav ji alî milet û dîroka Kurd ve baş nayê zanîn ku mirov bikaribe hin tiştan li ser wan peykertan bibêj.


Le belê iro hunerê peykertaşî li Kurdistanê bi şiklekî din rola xwe dilîze û gav bi gav pêş ve diçe. Bi taybetî ji li Silêmaniyê Înstîtu Hunerî Xizmetek mezin ji kultur û mîjûy Kurd re dike.

Iro gelek Kurd vê Înstîtu qedandine û ji niştiman û mîletê xwe re xizmete dikin.

Pirs: Helbet hin ekol di warê peykartaşî de hene, ger tu karibî bi kurtî behsa wan bîkî, tu bi xwe di nav kîjan eko-lê de karê xwe dimeşinî?

Bersiv: Riya hunerî ya ku min daye ser, realizm e. Çunkî ez wiha dibînim ku civaka Kurd ji vê rîbâzê (ekolê, riye) baş tê dîghîje û geleki jê hez dike. Ji ber vê yekê ez geleki xebitîme ku bi aliyê hunerê xwe nê-zîkî milet bim. Her weha ev hunerê peykertaşî ku min kiriye hemûyê wan jî raste-rast peywendî bi jiyana civaka Kurda ve heye.

Huner tenê ne ji bo huner e, ji ber ku ji vî hunîri beşekî mezin ji bo gel tê çêkirin. Loma jî dibê bi serê xwe pêwen-diya hunerî bi temametiya milet re hebe û milet jî, jî isti-fade bike. Herweha dibê ku huner karibe ew problemen ku milet dişine çareser bike, ji bona rakirin wan rî nîşan bide.



dest bi durustkirina peykere Palme kir. Bê guman Partiya Sosyal Demokrat jî ev pêşniyara min qebûl kir. Min du peykere Palme çêkirîye; jê yek, makêtek biçûk e û 20 cm qiyasa wî ye. Ev peykar bi şiklekî hunerî çêbûye û gulek sor bi yaxa Palme ve heye.

Peykerê din, ê duyem portreyekî Palme ye ku kenekî pirr bi mane li ser lîva wî heye. Lî belê hetanî nuha partiya Sosyal Demokrat bersiva min ne daye, ku ez jî vî peykerî mezin bikim û bi temamî biqedinim.

Pirs: Eserên te yêna heta nuha ci ne?

Bersiv: Berhemên min ên hunerî gelek in, hinek ên nîgarkêşî û hinek jî ên peykartaşî ne. Ew tişten ku ez girîng dibînim û min kirine ev in:

a)Peykerê Kawayê Asinger, ku min li Bexdayê çêkiribû û heta nuha maye.

b)Peykerê Kawayê Asinger ku min li Silêmaniyê ji cîmentoya si-pî çêkiribû, piştî 40 rojî xera kirin.

c)Peykerê şehîd Leyla Qasim ku min ji dar çêkirîye.

d)Peykerê Axirî Zemîn Aşitiye ku min ew jî ji dar çêkirîye.

Ez gelekî sipasî rojnama Ar-manc dikim û hêviya serkevtina we û xwendivanen wê dixwazim.

Pirs: Nuha xerîkî ci yî, ji bo ro-jen pêş te ci program daye ber-xur?

Bersiv: Nuha ez zimanê Swêdî dixwînim. Programma mina du waroj (musteqbel) ev e ku li Swêd li Agademiya Hunerî besê peykertaşî (skulptur) bixwînim.

Ez gelekî sipasî rojnama Ar-manc dikim û hêviya serkevtina we û xwendivanen wê dixwazim.

Pirs: Em jî bi navê Armancê sipasî te dikin.



Hêzên Kolonyalîst heykelê Kawa hilduşînîn

• DI FIQREY BI DIMILKİ •

Arêkerdox: KOYO BERZ SEREYÊ CÎ PA BÎ PA NÊBÎ

Rojê birê dewi gîrêno, awa ci nîna. Dewi jî vanê se bî, se nábî, ma se kerê senî bikerê: janê "Willi dêw fina ame, awa bîrdê ma bîrnê, ma şî-rê veyn dê Hesoy, wa Hesoy bîro şîro bîrî bin, wa bîrî bin dêwî bikişo. Bê hesoy o ki dêvî bikişo çinî yo." Şînê keye ra veyn danê Hesoy. Wexto ki veys danê Hesoy, Hesoy kaye di tîrş qîloxi-ranwerdê. Heso yeno, vano:

—Çiçî yo, şima yê qandê çiçî veyn danê mi?

—Dêw ameyo, fina awa bîrdê dewi birnaya, hadê ti do senî bikerê, senî dêwî bikişê ki awa ma bîro? Heso şemşêre xo gêno û şino bîrî ser. Wanê:

—Ti do senî bikerê?

—Şirê, mi rî keye ra resenê biyarê, e do Inganê xo resena girê da û şira bîrî bin di şemşêrdê xoya dêvî bikişo.

Şînê keye ra resen anê, linganê Hesoy resena girê danê û Hesoy verdanê bîrî bin. Heso, bîrî bin di şemşêre xo ge na kişa hîl keno ge a kişa hîl keno û bîrî bin di qîjeno:

—La dêw, ti camêrd ê mi rî biviji teber, ez teber ra to lete kera!

Xeylê şemşêre xo hîl keno, şemşêre ci guneno sida bîrî û siyeri ra xîjîkêno, yeno seredî Hesoy ro guneno, sereyê Hesoy perneno, miyanê bîrî beno pîrê gûni. Hendê nîm sehati tepeya Hesoy ancenê cor. Winenê serey Hesoy pa çinîno. Jew vano:

—Wexto ki ma Heso verda bîrî bin, sereyê Hesoy pa bî, pa nêbî?

O vano "ez nêzana", o vano "ez nêzana"; vanê "hadirê, ma şirê cinîya Hesoy Eyso ra pers ke-rê. Danê pîro şînê keydê Hesoy, veyn danê Ey-so, vanê:

—Eyso, wexto ki ma veyn da Hesoy. Heso keye ra ame, wexto sereyê Hesoy pa bî, pa nêbî?

—Wexto ki şima veyn da Hesoy. Hesoy wexto tîrş qîloxitân werdê; fekê Hesoy luwayê, nêzana sereyê ci wexto pa bî, pa nebî, nîno aqildê mi. O ki ez zana, tîrş qîloxitân werdê, fekê ci luwayê, ma di qisey kerdê, nêzana sereyê ci pa bî, pa nêbî?

Dewîjî pêro vanê "willi nîno aqildê ma, ma wexto ki veyn da Hesoy, sereyê ci pa bî, pa nêbî"

ZÛRÎ

Wexte di teney biray benê. Birawo jew tim zûrî keno û zûrano girweyê xo rawo beno. Birawo bin vano "No birayê mi tim zûrî keno û bi zûrana girweyê xo tim vineno û rawo beno. Ne-ya tepeya e do jî zûrî bikera, hele senî beno. Beno ki girweyê mi jî rawo şiro, beno ki e jî zûrana girweyê xo bivîna"

Rojê cema'ateda bol ronişte beno. Nê cema'atî miyan di wirna biray jî ronişte benê. Birawo ki caran zûrî nêkerde cema'atî rî vano ki:

—Cema'at şima zanê vizér şan di se bî?

Cema'atî ra jêwdî ci vano:

—Heyran vajî se bîbî?

—Hewa re vengê kutikî ameyê, hewa ra kutik lawayê.

—Qebrax, zûrî meki, hewa di kutik çiçî geyrano?

O néseño cewabê merdekî bido. Birawo ki tim zûrî keno, vano:

—La qebrax ti yê, mi jî dî hewa re vengê kutikî ameyê, kutik hewa ra lawayê!

—Hewa ra kutik senî laweno, girweyê kutikî he-wa di çiçî yo?

Banan pey di qatirê merdebî, leyre kutikan leşî sero arê biyaybî, goşte qatiri werdê. O sîre di qertelêno cilîn ame bi leşta qatiri ro, qatiri hewa dê cor, xora qabirxeyê mendibî, leyredê kutikî qabirxandê qatiri miyan di mend bi. Qabirxandê qatiri miyan di tersandê xo ra ha babo ha ba-bo hewa di lawayê.

—Bewnî dezayê min, newe bî. Kes qisêde doxrî rî nêşeno vajo zûrî yo. Raşta, bol finî qabirxandê leşan miyan di kutikî mendê û qertelan leşî hewa dayê û berdê cana.

Cema'at werzeno, beno vila. Birawo ki tim zûrî keno, bîrardê xo rî vano:

—Bewnî birayê min, newe min zûrê to kerdê raşti. Fina ti zûrî kenê, zûrano xo ûmîş ki. Salme zûrî meki. Bê ûmîşkerdeni salme salme zûrî nêbenê. Bewnî mi jî zûrî kerdî, hewa di kutik mutik nêlawayê, ema mi zûrî kerdî, doxrî ûmîş kerdî. Ez bol zûrî kena, zûrano xo jî ûmîş kena. Zûrî kerdene karêdo rind niyo û karê herkesi jî niyo. Her kes nêşeno ûmîş kero. Wa no to rî ders bo, zûrî meki!

Pirs: Gelşen (problemen) peykertaşıya Kurdi ci ne? Ev huner cîma paşde maye û ji bo pêşdeçûnê ci hewce ye?

Bersiv: Tunebûna dewletêk Kurdi û perçebûna Kurdistanê di nav çar dewletên xwînx-war de. Ji bo paşdemân û pêş-veneçûna hunerê Kurdi rolek pirr mezin lîstiy. Ev dewle-tên faşist û Kurdujuk naxwazin ku mîletê me hunerê xwe bi azadî pêşve bibe, ew li dijî her babet hunerê Kurdi.

Pirs: Bi qasî ku em dizanîn te xebatek li ser heykelê O. Palme jî dikir. Ev xebat di çi rewşê de ye?

Bersiv: Belê min bi xwe pêşniyar kir ku peykerekî Olof Palme çê bikim. Piştî kuştina Palme bi mehekê min



Demek ji xebata Kosret li ser skulpturê Palme